

Piştî kampanyaya
bi kurdî, hin
rewşenbîrên kurd xwe
hînî nivîsandina
bi tirkî dikin!
We ji bo
kampanyayê çi kir?

Berxwedanên birçîbûnê pêl bi pêl berfireh dibin

● Li çar hêlên dinyayê grevên birçîbûnê didomin. Ji Hewlêr heta Amedê, ji wir heta Edene, Îzmîr û Stenbolê, ji wir ber bi Afîna, Cenewre û Berlînê, ji wir heta Stockholm, Paris û Londrayê, ji wir ber bi Savya (Lîbya), Sidney û Washingtonê, bi hezaran kes di livbaziya aştiyê de mil bi mil in. Li hêla din li Stenbolê li Sultanahmedê bi hezaran kes, meşiyên. Bi dehan kes hatin birîndarkirin û girtin, li aliyê din, di cenazeyê Gülnaz Baxistanî de (1'ê firmehê) 35 hezar kes li Berlînê meşiyên.

● "Ew kurdên ku ji bo bohsteke erd, ji bo gurzeke gîha, ji bo berxekî an jî mirîşkeke xwe mêr dikuştin, îro bi temamî erd, ax û welatê wî, pez û darên wî jê hatine standin û wêrankirin. Gava kurdekî, kurdekî din dikuşt bi sedalan heyanî heyfa xwe hilneda, neyartiya yê din dikir. Lê di roja îro de bi hezaran zariyên wan hatine kuştin. Ew êdî dev ji vê mucadeleyê bernadin. Bila dost û dijmin vê baş fêmbikin."

Rûpel 8-9



Zarokên nûhati jî bi malbatên xwe re dikevin livbaziyan û hînî nişana serkeftinê dibin.



Rojnameyên dijber biryara sansûr ya MGK'ê nixandî:

Dewleta tirk tengezar bûye

● Dewlet kirinên xwe yê wekî îşkence, kuştinên bêdarizandin, girtina nivîskar, weşankar û rewşenbîran, berhevkarin û sansûra li ser weşanan didomîne. Dewlet ji bo ku sûcên xwe weşêre, berê xwe dide weşanên muxalîf, li gorî hesabên ku ew dike di dema gûhartinên di Qanûna Bingehîn de êrîşeke bi vî rengî wê zêde balê nekişîne ser xwe.

Rûpel 2

Gelo wê Chaplin jî bi kurdî bipeyive?

● Berpirsa NÇM'ê Nuray Şen: "Em bangî herkesê ku dixwazin sînemaya kurd û medya kurd pêşbikeve, dikin û dibêjin bila werin beşdarî van semîneran bibin. Helbet ji derveyî me jî ev faalîyet dikarin bêne çêkirin. Heger ku xizmeta van faalîyetan bigihîje gelê me, emê hurmetê nişanî wan bidin, alîkarî û destekê bidin wan."

Rûpel 13

DİPLOMASÎ

PKDW'ê dengê xwe gihand Amerîkayê

Gelê kurd û kurdistanî bi xebatên dîplomasiyê yê nûnerên xwe doz û daxwazên xwe digihîne mirovahiyê. Di navbera 17 û 27'ê tîrmehê du endamên Parlemantoya Kurdistanê li Derveyî Welêt Remzi Kartal û George Aryo çûn Amerîkayê, ji bo danasîna doza gelê kurd û PKDW'ê hevdîtin û civînên girîng pêk anîn.

Rûpel 5

HEFT ROJ

Livbaziyan gerîla zêde dibin

Li gorî agahî û saloxiyên ku me bi alîkariya ajans û çavkaniyên herêmî bi dest xistine, di livbaziyan gerîlayan de zêdebûnek tê dîtîn. Di van lihevixistin û şeran de gerîla gelek ziyar dane hêzên dewletê û cerdevanan. Ji aliyê din ve, gerîla herêma xwe ya ku livbaziyan lê pêk tîne, firehtir kiriye.

Rûpel 10

HELBEST

Lorîka Adîloş

Ava Hemrewat qerimî
Li ser Dicle çar tilî qeşa
Ji çalê bi kar tînin

em ava xwe

Bo tasik û beroşa
Ji lîlavê em çêdikin

çaya xwe.

Mîna razekê vedîşêre
Dayika min jana xwe.
"Baye, buharî dê çit"
dibêje.

Rûpel 16

DÎROK

Derdê miletê me

Derdê miletê me çi ye?
Ew çira heya îro ûsa maye?
Bi min ev her du pirs bo me pir xedar in. (ez dibêjim) çi ye; dema ko yekî ji me, ev pirs got tu dîbêjî qey ayeteke quranê ye; jê venagere.

Rûpel 7

Rojnameyên dijber biryara sansûrê ya MGK'ê nixandî:

Dewleta tirk tengezar bûye

Çapemenî wekî hêza çaremîn ya demokrasiyê tê binavkirin, nebûna azadiya çapemeniyê tesîreke neyînî li demokrasiyê jî dike, lê çapemeniya "mehmetçîk" li gorî brîfîngên MGK'ê dixebite, qet dengê çapemeniya dijber, bi taybetî jî çapemeniya kurd, nabe xwe. Wezîfeya hêzên demokratîk û çapemeniya dijber parastina mafê gelê bi destxistina agahiyên rast e. Liberxwedana çapemeniya dijber a li hemberî kirinên dewletê, wê derbeyê li çewtagahdarkirina çapemeniya resmî jî bixe.

Tirkiye warê rûdanên sosret e. Li aliyekî qala demokrasiyê tê kirin, li aliyê din her cure zilm û pêkutî berdewam in. Li hêlekê salvegera rakirina sansûrê tê pîrozkirin, li hêla din sansûr berdewam e. Hinek sazîyên rojnameyan xelatan li hev belav dikin, lê guh nadin banga rojnamegerên ku tîkên kuştin.

Rojnameyên fermî roja 24'ê fîrmehê, salvegera 87'an a rakirina sansûrê pîroz kirin, bi vî mebestê li hev xelat belav kirin, roja 28'ê fîrmehê Lijneya

Ewlekariya Neteweyî (MGK) biryara berfirehkirina sansûrê da.

Li gorî agahiyên ku hin endamên lijnayê gihandin çapemeniyê, di civînê de hate gotin ku divê kontrola li ser weşanên "cudaxwaz" zêdetir bibê, her wiha divê weşanên "çepgir û rastgir ên tûj" li çapxaneyê bê kontrolkirin û pişt re bî belavkirin. Li ser vî meseleyê me pîrsa xwe ya li jêrê gihandê 6 rojnameyan Yeni Politika, Evrensel, (Yeni Yüzyıl, Roj, Selam û Söz) û me xwest em reaksiyon û nixandînin wan hen der heqê vî yekê de bistînin.

Lê ji wan bi tenê bersivên Yeni Politika, Evrensel, Söz, Rojê gihîştin destê me:

"Wekî tê zanîn MGK'ê di civîna xwe ya dawîn de biryar da ku kontrola li ser çapemeniyê gurtir û berfirehtir bike. Der barê vî yekê de nixandînen we çî ne. Ev biryar wê çawa tesîrê li we bike û li hemberî vî dikare çî bê kirin?"

Hedef çapemeniya kurd e

Rojnameya Yeni Politika û Rojê diyar kirin ku hedef çapemeniya kurd e. Gerîndeyê Weşanê ya Yeni Politikayê Leyla Peközê got: "MGK di brîfîngên xwe de nêzî 3 sed weşan û tv û radyoyan, ku li ser kurdan û problema kurdî radiwestin, wekî hevkarê PKK'ê bi

nav dike, di eynî brîfîngan de awayê nûçe amadekirinê hîn rojnameyên tirk dike." Leyla Peköz dadixuyîne ku ew çapemenî jî li gorî dersa ku fêr bûye dixebite û çavên xwe, ji tiştên kurd û ku dewlet tîne serê çapemeniya kurd re digire. Peköz biryarê wekî weşartina du-pîvaniya ku tê kirin bi nav dike û dibêje: "Ez bawer nakim ku rojnameyên din jî bî sansûrkirin, ji ber ku ew bi ser dewletê ve naçin." Gerîndeyê Weşanê ya Yeni Politikayê li ser sedema biryarê jî vî dibêje: "Bi vî yekê dewlet dixwaze sîcên xwe weşêre."

Rojnameya Rojê, vî biryarê wekî sansûreke lê zêdekirî bi nav dike, ji ber ku berê jî bi awayê fîlî û nerasterast sansûr li ser wan hebûye. Gerîndeyê Weşanê yê Rojê Mehmet Mutlu wiha didomîne: "Di vî qonaxa ku li ser navê demokratîkbûnê qanûna bingehînê guhartin de, MGK hêvî dike ku êrîşên li ser çapemeniya kurd wê zêde balê nekişîne." Mutlu, biryarê wekî nîşana gurbûna şer dinixîne.

Gerîndeyê Weşanê yê rojnameya Söze Merdan Yanardağ jî vî biryarê wekî nîşana tengasiya dewletê dibîne û dide zanîn ku wê dewlet hinekî tûjtir bibê. Merdan Yanardağ wiha dibêje: "Nakokiyê tûj di navbera kesên ku dixwazin rewşa heyî biparêzin û yên ku

Dewlet di warê demokrasiyê de mafê axaftinê nade tu kesî, lê kirinên xwe yê wekî îşkence, kuştinên bêdarizandin, girtina nivîskar, weşankar û rewşenbîran, berhevkerin û sansûrê li ser weşanan didomîne. Biryara berfirehkirina sansûrê dide der ku dewlet di nava tengaviyê de ye.



Serleşkerê Artêşa Tirk Org. İ. Hakkı Karadayı

dixwazin çeperê mafê azadiyan berfirehtir bikin de, heye." Ew dixuyîne ku wê encama şerê di navbera her du aliyan de çalakîyên hêzên azadîxwaz diyar bike.

Ji hêla din ve Rojnameya Evrenselê balê dikişîne ser nakokîya di navbera gotin û kirinên rayedarên dewletê de. Di daxuyaniya ku li ser rojnameyê jî me re hate şandin de, ev tî gotin: "Li ser demokrasiyê axaftin gelek e, lê berê keştiyê neguherîye û kirinên li dijî mirovahiyê didomin. Rayedarên dewletê bi vî awayî rûyê xwe ji raya giştî veşêrin, dixwazin gel bixapînin."

Ji 112 hejmarên Politikayê 104 hatine sansurkirin

Piştî vî nixandîne li ser pîrsa "Wê ev biryar çawa tesîrê li we bike"

piraniya rojnameyan da zanîn ku wê bi vî biryarê pesta dewletê li ser wan zêde bibê. Yeni Politikayê da zanîn ku jixwe sansûr li ser rojnameyê heye, lewre ji bo wan zêde tiştê naguhere, Gerîndeyê Weşanê ya Yeni Politikayê Leyla Peközê em agahdar kirin ku ji 112 hejmarên rojnameyê 104 hejmar hatine sansûrkirin, Wê ev kar wekî hovîtiyekê bi nav kir, da zanîn ku çapemeniya mehmetçîk jî hevparê wê hovîtiyê ye. Her wiha rayedarên Evrenselê didin zanîn ku hîna demeke kurt e ku Evrenselê dest bi weşanê kirîye, lê dîsa jî 7 hejmarên rojnameya wan hatine berhevkerin. Gerîndeyê Rojê Mehmet Mutlu jî, li hemberî vî pîrsa me her wekî Leyla Peközê balê dişîne ser astengên li ber belavkirinê. Meh-

met Mutlu wiha dibêje: "Dema dewlet naxwaze nûçeyek bigihîje destê xwendevanan, bi hinceteke komîk DGM vî hejmarê berhev dike. Dema me di hejmarê xwe ya 7'an de wêneyê ku leşkerê guhê mirovekî jê dike derxist, DGM'ê peyveke di nava nivîsekî de, wekî sedem nîşan da û rojname berhev kir."

Li ser tiştên ku divê bê kirin Gerîndeyê Weşanê yê Söze Merdan Yanardağ dibêje: "Tiştê ku divê bê kirin, berfirehkirina eniya demokrasiyê û azadiyê ye. Pêwîst e weşanên ku demokrasiyê jî xwe re dikin ku û derd piştgiriya hev bikin." Li aliyê din Gerîndeyê Politikayê jî ber pratîka çapemeniyê, ne zêde bihêvî ye û vî dibêje: "Banga me ji bo hevkarîyê û piştgiriyê her heye, bes heta li qada navneteweyî dengê piştgiriyê bilind nebe, kes dengê me nabe xwe."

Ew diyar dike ku çapemenî hêza çaremîn ya demokrasiyê ye, azadîbûna çapemeniyê, dibe sedema qelsbûna demokrasiyê jî.

Rojnameya Evrenselê şerê li hemberî sansûr û zilmê, parastina mafê gelê bidestina nûçeyên rast, wekî wezîfeya çapemeniya dijber dibîne.

Her wiha rojnameya Rojê jî dide zanîn ku wê ev biryar tesîrê li rojnameyên din jî bike, lewre hemû weşanên dijber divê bi hêz piştgiriya xwendevanên xwe, hevgerî û yekîtiyê xurt ava bikin.

SAMÎ BERBANG



Wezîfeya MGK'ê 'tawsiyekirin' ya hikûmetê bicihanîna wê ye.



PKDW'ê biryara kongreya neteweyî da

Di navbera 30'yê tîr-meh û 1'ê gelawêjê de Parlemantoya Kurdistanê ya li Derveyî Welat (PKDW) komcivîna xwe ya duyemîn a asayî (adetî) li peytexta Awustriyayê li Viyanayê çêkir. Di civînê de hin biryarên girîng hatin girtin. Biryarên civînê, di civîneke ji bo çapemeniyê de roja 2'yê gelawêjê ji aliyê Serokê PKDW'ê Yaşar Kaya û Serokê Konseya Birêvebir Zübeyir Aydar ve hatin daxuyandin.

PKDW li ser pêkanîna kongreya neteweyî bi tay-

betî sekinî û wezîfeya avakirina lijneyeke amadekar da konseya birêvebir. Wê lijneya amadekar ji bo avakirina kongreyê hevditin û serdanan pêk bîne. Bi vê mebestê û bi mebesta navberiya şerê birakujiyê wê heyetek ji parlamentoyê biçe başûrê Kurdistanê.

Parlemantoyê nerazîbûna xwe li hemberî şerê navxweyî ji êşkere kir û da zanîn ku wê ji bo sekinandina şer xebatê bike.

Li aliyê din, 21'ê adarê roja cejna Newrozê, wekî cejna neteweyî û tatilê hate îlankirin. Li gorî biryarê,

wê Newroz li derve û li Kurdistanê bi awayekî resmî bê pîrozkin. Hate peji-randin ku bendên 2 û 8'an ên avabûna parlemantoyê bîn guhertin. Parlemanto li ser sîstema sekreteriya giştî û konseya birêvebir ji sekinî. Li gorî agahiyên ku bi dest ketin, wê parlemanto ji beşdariyên nû re vekirî be, ji ber vê yekê heke pêwîst be wê hîlbijartinên demdemî ji li dar bikevin.

Parlemantoyê ji bo greva birçîbûnê ya 10 hezarên dilên PKK'yî, malbatên girtiyên û kurdên aştxwaz, piştgiyariya xwe diyar kir.

Di civînê de PKDW'ê amblema xwe ji eciband. Hate gotin ku di nav gelek berhemana de ya ku Leman Günayê amade kiribû, hatiye bijartin. Şeklê amblema nû wiha ye: Li ser zemîne zer roja sor, li ser rojê nexşeya Kurdistanê ya bi rengê kesk û li dorê guliyên dara zeytûnê.

Herwiha du endamên konseya birêvebir ji karê xwe veqetîn, li şûna wan M. Emîn Pencewînî û Serhat Bucak bûne endamên konseya birêvebir.

Navenda Nûçeyan

Ji bo Kani Yılmaz civîna gel


Piştî biryara dadgeha Îngiliz ya ji bo îadekerina Bepirsê ERNK'a Ewrûpayê yê berê Kani Yılmaz, li paytexta Îngilistan, Londonê civînek ji bo gel çêbû. Civîn bi beşdariya Mebûsê Partiya Karker a Îngiliz John Auistin Walker û Parêzer Bridget Irwinch roja 1'ê tîrmehê li Komeleya Karkerên Kurdistanê li dar ket. Mebûsê Partiya Karker Walker axaftinek kir û di vê axaftinê de diyar ku dewleta tirk zilmeke bêhempa li gelê kurd dike û bi komployeke dewleta Îngiliz û alman Kani Yılmaz hatiye girtin. Walker biryara girtin û îadekerina Yılmaz wekî skandaleke politîk bi nav kir. Li aliyê din Parêzerê (abûqatê) Kani Yılmaz Irwinch da zanîn ku wê îtirazî biryara mehkemeyê bike. Parêzer Irwinch got: "Bi texmînî wê heta rezber û kewçêrê mehke-

meya îtirazê biryarekê bidê."

Li aliyê din Kani Yılmaz bi daxuyaniyekê, kirinên dewleta alman ên li hemberî kurdan protesto kir û piştgiyariya xwe ji bo berxwedana birçîbûnê nîşan da. Her wiha di daxu-

yaniya xwe de şehîd Gulnaz Baxistanî bi bîr anî û gote ku ew bi destê polisên alman hatiye kuştin. Yılmaz ji Almanyayê xwest ku dev ji vê politîkaya xwe ya çewt û bêmane berde.

Kurd-A/Welatê Me



Kani Yılmaz

Rapora TOBB'ê: Dewlet bi PKK'ê re nikare serî derkeve

Rapora Yekîtiya Menzel û Borsayê ya Tirkîyeyê (TOBB) ya li ser kurdan roja 3'ê tîrmehê bi civîneke ji bo çapemeniyê hate eşkerekirin. Ev rapor li ser lêpîrsîn û anketên ku Polîtîkazan Doğu Ergil çêkirine, ava bûye. Her çiqas saziya ku rapor amade kiriyê, xwestiyê hinek encamên li gorî dilê xwe jê derxe û di nava raporê de hinek nakokî balê bikişîn ser xwe jî, gelek xalên girîng derketine holê. Wisa dixuye ku wê ev rapor demekê bibe mijara nîqaş û gengeşeyan. Tê gotin ku li hinek bajarên Kurdistanê wekî Batman, Amed û Mêrdînê û li hinek bajarên Tirkîyeyê wekî Edene, Mersin û Antalyayê ji 1267 kesî hatiye

pirsîn. Li gorî anketê % 90 kesê ku jê hatiye pîrsîn, xwe kurd dibîne, % 89.8 zimanê xwe yê makî wekî kurdî bi nav dike. Dîsa rapor dibêje ku % 76 kesî daye zanîn ku dewlet nikare bi PKK'ê re serî derkeve, % 46.7 piştgiyariya dide PKK'ê û ev rêje li bajarên ku kurdên koçber li dijî zêdetir dibê. % 34.8'ê ku jê hatiye pîrsîn dane zanîn ku lîzîmên wan di nav refên PKK'ê de hene. Li gorî raporê ji 13'yê kurdan serxwebûnê % 13 xweseriyê, % 10 reforman û % 42.5 jî federasyonê dixwazin. Herwiha divê bê gotin ku % 61.4 bersiv nedaye pîrsa "Hûn bi kîjan kirinên PKK'ê nerazî ne?" û pîrsa li ser "Hûn çi mafî dixwazin ji bo kurdan".

...KURTENÜÇE...

Tirkîye û Îran penaberan bi hev diguherin

Dewleta ku hemû qaydeyên însani dide bin piyan. Niha jî, ji bo ku Îran rê li ber xebatên PKK'ê bigire, dewleta tirk mirovên îranî; çî kurd, çî faris, çî azerî berhev dike dişîne mirinê ango teslîmî Îranê dike. Roja 4'ê gelawêjê jî Tirkîyê 15 malbatên ji 50 kesî pêk hatî, teslîmî Îranê kirin.

Afrîkaya Başûr jî çekan nade Tirkîyeyê

Dewletên dinyayê yek bi yek ambar-goya çekan datînin ser Tirkîyeyê. Li gorî nûçeyêke The Economistê, Afrîkaya Başûr diyar kir ku wê çekan nefiroşe Tirkîyeyê. Dihat plankirin ku şirketên vî welatî bi buhayê 330 milyan dolarî çekan bifiroşin Tirkîyeyê. Wezîrê Parêziyê Ronnie Kasrils got: "Me ji bo başiya kurdan ew biryar girtiye û bi vê yekê jî em serbilind in.

Madeya 8'an li Yüzyılê jî xist

DGM'ya Stenbolê der heqê Yeni Yüzyılê de li gorî madeya 8'an doz vekir. Rojnameyê da zanîn ku sedema dozverikîne hevpeyvîna bi Serokê PSK'ê Kemal Burkay re ye. Ji ber vê hevpeyvînê jî bo xwediyê rojnameyê Dinç Bilgin û Bepirsê Nivîsaran İsmet Berkan, ji 6 mehan heta 2 salan cezayê hepsê û zêdetirî 100 milyonî jî cezayê pereyan tê xwestin.

Mamoste jî aştiyê dixwazin

Lijneya Kargerîyê ya Eğiitim-Senê roja 2'ê gelawêjê bi daxuyaniyekê da zanîn ku ew aştiyê dixwazin. Hate diyarkirin ku divê ji meseleya kurdî re çareyê demokratîk û aştiyane bê dîtin. Di daxuyani de tê gotin ku ji bo jiyaneke bêkedxwarî û bêşer, pêwîst e hemû mirovên aştxwaz dest bedin hev.

Dewlet sendikayê naxwaze

Dewlet karmendên bisendîka surgûn dike. Heftêya çuyî rayedarên Tarîm-Senê dan zanîn ku li seranserê Tirkîyeyê 32 endamên wê sendikayê hatine surgûnkirin. Sekreterê Giştî yê Tarîm-Senê Mustafa Gürsoy got ku di 26'ê gulanê de li dijî surgûnkirinan meşek li dar xistine û Şewirmendê Wezîr Cengiz Aldemir soza sekinandina surgûnê daye wan, lê tiştê neguheriye.

Kes bi dewleta tirk nexapî

Guherînên ku meclîsa tirk roja 23'ê tirmehê di Qanûna Bingehîn de pêk anîn, dawî li rexneyên sazîyên navneteweyî neanî. Piştî guherîna hinek sazîyên wekî Rêxistina Efüyê ya Navneteweyî, Yekîtiya Ewrûpayê û hinek endamên Kongreya Amerîkayê nerazîbûna xwe diyar kirin.

Rêxistina Efüyê roja 26'ê mehê li ser vê mijarê daxuyaniyek da çapemeniyê û ji Tirkiyeyê xwest ku dawî li binpêkirina mafên mirovan bê. Di daxuyaniyê de tê gotin ku tu têkiliyên madeyên ku hatine guhertin bi mafên mirovan nîn e. Daxuyani dibêje: "Tevî ku li Tirkiyeyê îşkence, qedexebûna derbirinê û înfazên bêdarizandin berdewam in jî, meclîsa tirk ji bo ku hejmara mebûsan zêde kiriye, temenê hîlbijêran kiriye 18 sal, xwe pîroz dike."

Rêxistina Efüyê bi hêsanî sê guharînan dixwaze: 1) Rakirin an gu-

herandina xal û bendên ku dibin sedema girtina mirovan ji ber bir û baweriyên xwe.

2) Berfirekirina çerçoveya mafê ku dîtina bi parêzer û malbatan re ji bo hemû mirovên di binçav de.

3) Kurtkirina muhleta di binçav de mayîne.

Daxuyani dibêje ku hejmara mirovên ji ber madeya 8'an bi girtinê re rû bi rû mane, gîhîştîye radeya herî bilind. Rayedarên Rêxistina Efüyê wek mînak cezakirina Mehdi Zana nîşan didin.. Mehdi Zana ji ber ku li Parlementoya Ewrûpayê axaftinek kiribû bi 12 mehan hatibû cezakirin. Tê gotin ku ev helwest tê wateyabinpêkirina Konvêsiyona Ewrûpayê ya ji bo Parastina Mafên Mirovan û Azadiyên Bingehîn ku Tirkiye jî hevpar e jê re.

Di daxuyaniya rêxistinê de tê gotin ku bi tenê di sala 1994'an de 29 kes bi îşkenceyê hatine kuştin. Daxuyani qa-

la Sinan Demirbaşê ku di 21'ê tirmeha 1995'an de li emniyeta Elezîzê hate kuştin jî dike.

Li aliyê din li gorî nûçeyê ku roja 31'ê tirmehê di rojnameya Hürriyetê de derket, Serokê Yekîtiya Ewrûpayê yê demî, Wezîrê Karê Derve yê Îspanyayê Javier Solana di civîna "Forumê Bahra Spî" de bi Wezîrê Karê Derve yê Tirkiyeyê Erdal İnönü da zanîn ku divê madeya 8'an rabe û mebûsên DEP'ê jî bîr berdan. Vê forumê li bajarê Tabarkaya Tunusê roja 30'ê tirmehê dest pê kiribû. Her wiha Radyoya Dengê Amerîkayê (VOA) li ser vê mijarê şîroveyek weşand, tê de hate gotin ku divê madeya 8'an biguhere.

Dewleta tirk li derve û hundir piştî guherîna Qanûna Bingehîn dest bi kampanyayekê kiribû, lê ev agahî derdixin holê ku dost û piştgirên dewleta tirk jî di nav de, kes bi wan nexapiye.

Navenda Nûçeyan



Heta guherîn çêbû, bêhna mebûsan çikiya.

Navê 5 kesên ku di xaçepirsa hejmara 36'an de peyva veşarî **'Banemêr'** dîtine û kaseta **"Deniz Koydum Adını"** ya Metin-Kemal Kahraman qezenc kirine:

M. Hacı İmran Mersin

Emrullah Zümrüt Semsür

Muhabet Bozkurt Bolu

M. Emin İmert Mêrdin

Orhan N. Amil Stenbol

XAÇEPIRSA BIXELAT (36)

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| İ | S | A | D | O | S | T | | |
| M | İ | R | A | T | E | | | |
| M | A | L | A | B | A | Ê | | |
| N | E | A | R | D | Û | S | | |
| E | S | A | Ş | T | Î | D | O | |
| E | N | Î | E | R | P | Â | R | |
| A | B | O | R | Î | Z | A | N | |
| R | N | R | E | M | E | Z | A | N |
| S | Î | K | A | P | H | Û | R | Î |

PEYVA VEŞARÎ → B A M E R N E

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, em dinirxînin. Xelat bi riya pişkê (kura) li 5 kesan tî belavkirin. Xelata hejmara 38'an; kaseta **DILŞAD** "Awazê kurdî" ye.

Xelata Xaçepirsa



Kapaxa "Awazê kurdî"

Jêrenot: Ji bo ku bersiva we bê nixandî, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.

XAÇEPIRSA BIXELAT (38)

| | | | | | |
|------------------------|-----------------|-----------------------------------|-----------------------------|------------------------|---------|
| İsmail (wêne) Riwayet | Sewalek Berik | Bermahiyân organik Hereket | Gihanekek Kinnivîsa Tirkiye | Vexwarînek Vêga | Ekonomî |
| Medeniyet | Notayek | Erdê bi av Lempe | Incax Cinavkeke îşarkî | Înşa Mam | Guman |
| Jêderk Navendeke Çandî | Kurkirin | Sembola lawrensyûm Yezdanek Misrî | Hêsanî Kinnivîsina Litnê | Dijwar Bêjînga çavîgir | |
| Betal Hidrojen | Tîmor, kîst Dîn | Pê masî digrin Sembola Neonê | Lî Rûsyayê robarek | | |
| Eks. eko Eşîr | Pakrewan | Lîva hevaya | | | |

PEYVA VEŞARÎ →

1 2 3 4 5 6 7 8

PKDW'ê dengê xwe gihand Amerîkayê

Gelê kurd û kurdistani bi xebatên diplomasiyê yên nûnerên xwe doz û daxwazên xwe digihîne mirovahiyê. Di navbera 17 û 27'ê tîrmehê du endamên Parlemantoya Kurdistanê li Dervayî Welêt Remzi Kartal û George Aryo çûn Amerîkayê, ji bo da nasîna doza gelê kurd û PKDW'ê hevdiîtin û civînên girîng pêk anîn.

Li ser navê Parlemantoya Kurdistanê li Dervayî Welêt (PKDW) Remzi Kartal û Nûnerê Asuriyan George Aryo ji 17'ê tîrmehê heta 27'ê tîrmehê li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) hevrûnişin û civîn bi nûnerên Kongreya Amerîkayê, rojnamevan, Rekestinên Ne-dewletî (Non-Government Organization, NOG), komên mafên mirovan û bi gelê kurd û asurî re çêkirin. Remzi Kartal û George Aryo du rojan jî ji bo piştgiriya beşdarî greva birçîbûnê ya li Washingtonê bûn.

Di navbera wan deh rojan de her du nûnerên PKDW'ê bi endamên Kongreya Amerîkayê; John Porter, Joseph Kennedy, John Lewis, Sam Gewdenson, C. Maloney, Anna Eshoo, Steven Horn, Esteban Torres, Jon Fox, Sten Hoyer, Senator Spector, Senator Bradley, Senator Fein-

gold, Senator Biden û hwd. re axaftinên pêwîst çêkirin. Di axaftinên xwe de Remzi Kartal û George Aryo dianîn ziman ku tenê bi riya diyalog û ramiyê pîrsa kurdan wê çareser bibe. Remzi Kartal di civîna xwe ya ku Nûnerê Kongreyê John Porter jî beşdar bûbû de, wiha got: "Wan rojan dewleta Tirkiyeyê li ser guhartina zagonên xwe diaxive. Ev guhartin ne ji bo çareserkirina pîrsa kurdan an jî bo pêşvebirina azarî û aştîyê ye; ev



Remzi Kartal

senaroyekê ji bo ketina nava Yekitiya Ewrûpayê û xapandina dewletên dinyayê ye. PKDW berpirsiyariya gelê kurd ê derbeder dike û dixwaze wê pîrsa giran bi hemû gelên cihanê bide naskirin û herwiha divê dewleta Amerîkayê jî bizanibe ku bê çareserkirina pîrsa kurdan aştî di Rojhilata Navîn de çênabe."

Nûnerên Kongreyê bixwe nameyek amedekirine da ku bidin Serokê Dewleta Amerîkayê Bill Clinton ji bo çareserkirina pîrsa kurdan bi riya aştî. Heta niha nêzikî 35

nûnerên Kongreyê ev name şanevav (îmze) kirine û heta 25'ê tîrmehê hejmarê nûneran wê ji 100'î derbas bibe. Di vê nameyê de nûnerên Kongreya Amerîkayê bangî Serokê Dewleta Amerîkayê Bill Clinton dikin ku PKDW bipejirîne û li ser pîrsa kurdan bi taybetî raweste. Her wiha di nameyê de tê diyarkirin ku her roj bi çekên Amerîkayê gelê kurd tê kuştin û gundên wan tên wêrankirin. Lewra jî divê şandina



Bill Clinton

çekên Amerîkayê ji bo Tirkiyeyê were rawestandin.

Remzi Kartal di hevpeyvîna xwe de bi Welatê Me re li ser gera li Amerîkayê wiha axivî: "Di dawiya axaftinan de hate diyarkirin ku dewleta Tirkiyeyê li Amerîkayê wê têkeve tengasiyên mezin. Her çiqas Serokê DYA'yê zehmetî derxistibe jî (Li ser mesela kurdan) Kongreyê 25 milyon dolar ji alîkariya ji bo Tirkiyeyê qutkir û wiha gava pêşemîn hate avêtin. Herwiha hate diyarkirin ku li ser pîrsên kurdan di navbera sero-



Hinek Endamên Kongreya Amerîkayê ji Clinton dixwazin ku ew PKDW'ê nas bike û ji bo çareserkirina pîrsa kurdî xebatê bike.

katiya dewletê û Kongreyê de ditînin cuda wê zêdetir bibin."

George Aryo bi anca ma ger û civînên xwe yên li Amerîkayê razibû û di hevpeyvîndina xwe ji me re wiha got: "Nûnerên Kongreyê anîne ziman ku gelê kurd ne gelekî kêmejmar e, niha çêtir tê tîgihîştin ku gelê kurd gelekî bindest e û têkoşîneke azadiyê li welatê xwe dimeşîne. Lewra jî nûnerên Kongreyê anîne ziman ku di dema pêş de dost û hevalên gelên kurd li Amerîkayê wê zêdekir bibin."

Her wiha her du nûnerên PKDW'ê ji bo nasîna PKDW'ê pîrr rûniştin çêkirin û dixwazin nûnergeheke PKDW'ê li Amerîkayê vekin. Di wî warî de pir dadwerên navneteweyî, nûnerên Kongreyê û rêxistinên mafên mirovan dixwazin ji bo wê xalê alîkariyê bikin. Remzi Kartal bawer e ku di nêz de wê nûneriyêke PKDW'ê li Amerîkayê vebe.

Wekî her cihê din li Washingtonê jî 12 kurd ji bo piştgiriya greva birçîbûnê ya li girtîgehên Tirkiyeyê ketine grevên birçîbûnê. Remzi Kartal û George Aryo ji bo piştgiriya wan armancan bi du rojan ketin grevê û li konê li hemberî avahiya Kongreyê pir civîn bi kurd û amerîkiyan re çêkirin.

PKDW nûnerê hemû kurdistanîyan e

Piştî wan ditînan George Aryo ji bo sê rojan li bajarê Cikagoyê bi gelê asurî re civîn li dar xistin. Li Amerîkayê bi taybetî li Cikagoyê 250 hezar asurî dijîn. Li Cikagoyê George Aryo bi Partiya Demokratîk a Mezopotamyayê, Kongreya Neteweyî ya Asuriyan û Komela Çandî ya Asuriyan re sê civîn çêkirin. Di wan civînan de Aryo bi giranî gelê asurî li ser rewşa Kurdistanê û pêşveçûyînên têkoşîna rizgarî agahdar

kir. Her wiha jî PKDW û armancên wê anîn ziman. George Aryo ev daxuyanî da Welatê Me: "Gelê asurî li Amerîkayê bi taybetî li Cikagoyê dijî û piraniya wan ji başûrê Kurdistanê hatine. Di wî warî de xwediyê serboriyên nexweş in. Bi taybetî tîkîliyên wan bi PDK'ê re nebaş bûne. Min anî ziman ku PKDW saziya hemû kurdistanîyan e û gelê asurî divê li hemberî rejîma faşîst, li nik şerê azadiyê cih bigire. Tevî hemû kemasiyên dirokî divê gelê kurd û asur bi hev re bi jîn û gelê asur vegere welatê xwe."

Di rojên dawî de her du nûnerên PKDW'ê bi komên mafên mirovan re li ser bînpêkirina mafên mirovan li Kurdistanê civîn li dar xistin. Bi taybetî civîna bi Komisyona Helsinki re bû sedema pêşkêşkirina mînakên li ser koçberkirina kurdistanîyan û şewitandina gundan bi destê hêzên dewleta tirk. Roja 27'ê tîrmehê civîna jî çapemeniyê bi serkeftîneke mezin li dar ket. Nûçegihanê Washington Postê bi nûnerên PKDW'ê re hevpeyvîn çêkirin. Herwiha Dengê Amerîkayê (Voice of America) beşa kurdî cih da hevpeyvîneke bi Remzi Kartal û George Aryo re.

Bi gera her du nûnerên parlemantoyê PKDW li Amerîkayê hate nasîn, gelek dostên gelê kurd çêbûn û wan soz dan ku bi baldarî li ser meseleya kurdan rawestin. Di rojên pêş de wê li Amerîkayê jî serê rayedarên dewleta tirk gelek biêşe.

DARA AZADÎ
Welatê Me
Washington

IRA û Îngiliz dixwazin xwe bigihînin qonaxeke nû



Şervanê IRA'yê Dominic Adams piştî ku hate berdan, pêşî keça xwe hembêz kir.

Piştî hevdiîtina Serokê Sinn Feinê Gerry Adams û Wezîrê Bîrtanyayê yê ji bo Bakurê Îrlandayê Sir Patrick Mayhew, rayedarên Sinn Feinê dan zanîn ku wê IRA çekên xwe daneyne.

Piştî wê hevdiîtina ku roja 27'ê tîrmehê çêbû, roja 30'yê mehê rayedarê Sinn Feinê Martin McGuinness got ku îhmal nîn e ku IRA çekên xwe radest bike. Wî got divê Bîrtanya dev ji wê daxwazê berde, ji ber wê daxwazê pêvajoya aştîyê jî dikeve talûkeyê.

Tê gotin ku heta IRA çekên xwe teslîm neke, civînên li ser dahatûya Îrlandaya Bakur çênabin. Xaleke ku dibe sedema nakokiyê jî berdana girtiyan e. Komarî dixwazin ku efûya giştî bê îlankirin û şervanên di

girtîgehên Îngilistanê de bîn berdan, lê hikûmeta Îngiliz wê daxwazê qebûl nake. Îngiliz dixwazin şervanên girtî bişînin girtîgehên Îrlandayê. Hefteya çûyî komarî (kesên nêzî IRA'yê vî navî li xwe dikin.) bi berdana girtiyekî hevkarê dewletê ku mirov kuştibûn zivêr (aciz) bûn.

Li aliyê din hikûmeta Îrlandayê roja 29'ê tîrmehê ji bo pêşvebirina qonaxa aştîyê 12 şervanên IRA'yê berdan. Sinn Fein li hemberî wê helwesta Îrlandayê dilxweşiya xwe diyar kir. Niha her du aliyên aştîyê jî dixwazin di salvegera agirbesa IRA'yê (30'yê gelawêjê) de xwe bigihînin qonaxeke nû, lê li pêş tu nîşanên gavên nû nayên ditîn.

Nûçeyên Derve

FAL



BERAN (21 Adar - 20 Avrêl)

Geşedan û bipêşketin, taybetiya we ya sereke ye. Lê hin caran hûn serê xwe di ber karê beredayî de pir dieşînin û ji kesî tiştêkî napirsin. Pêşiyê me gotine: "Bipirsin, netirsin" Bi vî awayî wê jiyana we hêsantir bibe.



GA (21 Avrêl - 21 Gulan)

Hûn naxwazin kes têkilî we bibe, bes hûn bixwe, xwe tevî karê herkesî dikin. Van rojan hûn hewl didin ku hin kes li hemberî we serî bitewînin, lê divê hûn bizanibin ku "Darê sitûr nabe gopal."



CÊWÎ (22 Gulan - 21 Pûşper)

Du aliyên şexsiyeta we hene, hin caran li hemberî bîrbirîna we mirov metel dimîne, lê van rojan tiraliyeke fikirîne di mêjiyê we de konê xwe daniye. Hûn jî dizanin ku "Berîka rûkan qul e." lewre divê hûn bîrî bidin karê xwe.



KEVJAL (22 Pûşper - 23 Tirmeh)

Hûn tim dixwazin ku li derdora we xweşî û geşî hebe. Vê hefteyê hay ji xwe hebin dibe ku hinek tiştên xerab li derdora we biqewimin. "Hînbûn ronahiya çavan e" divê xwe hîni rewşên xerab bikin.



ŞER (24 Tirmeh - 23 Gelawêj)

Dayî ji dil e, ne ji hebûnê ye. Tevî ku rewşa we ne xerab e jî, dema yek tiştêkî ji we dixwaze, hûn mirûzê xwe dikin. Bi vî awayî hûn tu caran nikarin dost û hevalan peyde bikin. Heke we dil heye tik û tenê bimirin hûn li ser riyê rast in.



SIMBIL (24 Gelawêj - 23 Rezber)

Qet kêfa we ji axaftina pir re nayê. Dema yek li hemberî we zêde bipeyive xewa we tê. Dev ji xwediyê xwe re xerab nabêje, lê zimanê we nagere ku hûn rewşa xwe diyar bikin, ji ber vê yekê tiştê ku devê we ji we re nabêje, xelk dibêje.



MÊZIN (24 Rezber - 23 Kewçer)

Hûn nikarin li derekê rihet bisekinin. Bihizûrî bêhna we teng dike, ev rewş nade ku hûn karê xwe bibin serî. Karê ku we dest pê kiriye bibin serî. Her wekî bavûkalên me jî gotine, "Li kerê siwar bûn şermek e, jê peyabûn du şerm in."



DÛPIŞK (24 Kewçer - 22 Sermawez)

Hûn ji ber kerba dilê xwe nexweş in, lê qet vê yekê nadin der. Nayê bîra we ku "Dinya wa re, ne mal e." Lewma kerba dilê we dil û kezeba we diperîfîne. Bi vî awayî hûn nikarin demeke dirêj bijîn. Mirineke bi vî rengî xêrê nagihîne tu kesî jî.



KEVAN (23 Sermawez - 21 Berfanbar)

Herkes we wekî mirovên ku tiştan zû ji bîr dikin, dizanin. Dijminên we tavilê têdighihîjin ku bi dijmineke/tûj re rû bi rû ne. "Darê zorbetiyê zû dişikê" Zorbetiyê li mirovan nekin û baş hay ji xwe hebin.



KARIK (22 Berfanbar - 20 Rêbendan)

Bala we tim le ser mirovan e, li ser wan hinek pêzanî û çavdêriyên we hene, lê ji ber şermokiyê hûn nikarin çavdêriyên xwe bînin zimên. Wekî Chamfort jî dibêje: "Firsend du caran li deriyê mirov naxe."



DEWLIK (21 Rêbendan - 11 Reşemî)

Belê hûn naxwazin bi tu kesî û bi tu deran ve girêdayî bin. Ev tişt wê bibe sedema kin-temeniya we. Rast e, "Gurî dimire, dibe gulîzer" lê gulîzerê mirî bi kêrî çi tê? Heke mirin be jî bila hêjayî gotinê be.



MASÎ (20 Reşemî - 20 Adar)

Ji we nayê ku hûn xwe li hemberî dijiwariyan xwe rabigirin. Hinek hevalên we hene, lê ne jidil in. Haya we ji gotîna "Hevalên parî, naçin alî" tune, lewra hûn hêvî dikin ku hevalên we bîn gazî û hawara we.

Banê me yek ban e

Havîn e, ji germê gundî tev li ser banan radizên. Wê rojê zavayê Xecê û kurê Xecê mêvanê û Xecê ne. Dema razanê cihê zavayê xwe û keça xwe li aliyekî yê banê datîne, yê kurê xwe û bûka xwe aliyê din datîne. Tev diçin ser cihê xwe û xwe dirêj dikin. Xecê diçe nivîna kur û bûka xwe li ser wan radike û dibêje:

Germ e, germ e. Xwe ji hevdu bidin aliyekî. Diçe wê nivîne dide ser zava û keça xwe dike û dibêje:

Sar e, sar e. Xwe bidin hev. Bûka Xecê hêrs dibe û dibêje: Ban yek ban e, aliyek deşt e yek zozan e.

Qehfika pîrika min

Rojêke ji havînê, şerbika ava darvanî dişikê û tî dimîne. Darê xwe bar dike û berê xwe dide malê. Di rê de liqayî xaniyê kê dibe, avê dixwaze. Keça malê qehfikekê ji binê cerî teji hemû difsan bikin dimis tîne jêrê. Darvan difsê vedixwe, keçik carik di ji qehfikê tijî difs tîne. Darvan wê jî vedixwê û dipirse: Qey difsa hewe îsal geleke ku şûna avê tu difsê tîni. Keçik:

Na, mişk ketibû difsê ji bo wê... Darvan hêrs dibe qehfikê li erdê dide û dişikê. Keçik ûûrrr û ûr digirî û dibêje: Te qehfika pîrika min ya gû şikand.

Kaniya gund

Li gundan, gundî tev xwe didin hev, her şev li hev dicivin û behsa karê hevdu dikin. Kes behsa kurê pîrê nake. Kurê pîrê jî vê hêrs dibe. Ji xwe re dibêje: Ezê sibê tiştêkî wele bikim, ku gundî tev behsa min bikin.

Wê şevê diçe dirî kaniya gund. Roja paştir gundî diçin ser kaniyê, dibînin hinan rîtiye kaniyê. Kê kiriye, kê kiriye... Pê dihesin kurê pîrê kiriye.

Wê şevê gundî tev behsa kurê pîrê dikin.

DR. HÛSEYÎN NANTU

Mehîna jar û piştkov

Sala 1965'an meha sermawezê bû, wî heyamî li gund dikana bavê min hebû. Rojêkê bavê min got:

- Di dikanê de tiştên firotinê kêm bûne, sibê ezê biçim wan tiştên kêm bikirim. Tu jî were alîkariya min bikî.

Wê demê ez zarok bûm, min qet bajar nedîtibûn. Ez pir dilgeş û peros bûm. Ji wê yekê, wê şevê heya sibehê xew neket çavên min, lê belê sibe bû.

Hingê tenê erebeyek (kamyonek) dihate gundê me. Ew ji servekirî bû, meha sermawezê li Serhedê pir sar e, tevî ku hewa sar e jî em dîsa li kamyonê siwar bûn. Heya em gihîştin Wanê ez qefilî bûm, kamyon li garajê sekinî. Bavê

min guh, dev û lêvên min mist dan, piçekî xwîn lê zivîrî. Ji bo ku em germ bibin em çûn çêstxaneyê, me virikek (şorbe) xwar. Ez baş kişt bûm, di hebûna xwe de min xwarineke welê xweş nexwaribû. Em rabûn ketin nava sûkê, belê sûk bi min pir geremol dihat, ez ditirsîm. Dîsa jî min nedihîşt ku bavê min bi min bihese. Em ketin hundirê dikanekê, xwediyê dikanê tirbitî bavê min bû, vî zilamî xêrhatin li me da û ji me re çay xwest. Li dû çayê tiştên ku lazim bûn bavê min kirin. Me ew kirin girêdan û danî aliyekî. Heçî tiştên ku li dikanê kêm bûn me ew jî kirin, me hemû li dikana tibrît kom kirin. Ez li dikanê mam, bavê

min çû ku erebeyeke hespan bîne, ji bo ku em tiştên xwe lê bar bikin, bibin ba kamyonê. Min mêze kir ku li pêşiya erebeyê mehîneke jar û piştkov, pûrt li ser çermê wê kiç bûye, ji ber sermayê mîna dareke siphani direcife, ciharê (tûr) ka û cehî jî di stûkurê wê de bû. Belê ew nedixwar. Cihê ku erebe lê sekinibû piçekî hevraz bû. Me tişt bar kir, erebe pir giran bû. Xwedî rabû li ser morwaskê siwar bû, şelaqek li mehîna da. Bi bawerîya min mehîna di wê saetê de razayî bû, xerezan (kirbaç) çawa lê ket heywan veçinikî, xwe avête rêya hevraz û bar giraz, mehîna nexweş û bêqewet bû. Ew bizorê diçû, dengêk ji paşiyê hat. Wekî fiçqe tersî avêt nava

çavên xwediyê xwe û li ser kelanî me hemû tev hetikîn. Rûyê xwediyê erebeyê tev hate sehandin, çavên wî di nav de direqisîn. Bavê min li ser wê yekê ji zilam re da dijmînan:

- Lawo ma min ne got jî te re ku ew heywan jar qels e, nikare vî barî bikişîne. Vêga wê çawa be rewşa me.

Xwediyê erebeyê: -Apo min jî nediviya ew bûyî bibe. Divê mirov şikurdar be.

Bavê min: - Lawo ez di şukra te û bavê te ...im!

Belê di vê navê jî ji kenan ez zikûpiştî bûbûm. Li gorî gotîna xwediyê erebeyê du-sê roj berî bûyerê mihîna şinahî xwaribû û bi zikêşê ketibû, ji ber vê yekê ew bûyer anîbû serê me.

Îro ez mêze dikim, ji ber pirs-girêka kurdan Serokwezîra Tirkîyeyê Tansu Çiller ciharê xwîna kurd û tirkan xistiye stûyê xwe, li gorî xwîna ku dide rijandin jar û zeif, bêqewet û bêşexsiyet bûye. Hefsarê wê di destê sosyaldemokratî de, xerazan di dest Tirkêş de ye. Mesut, Ecevit, Erbakan jî li erebeyê siwar bûne. CASIM BAYRAM



Em bêyî hev nabin

Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan mesajek şandibû Konferansa Navneteweyî ya Dîroka Kurdistanê. Konferans ji aliyê Enstîtuya Kurdî ya Berlînê ve di rojên 22-24'ê tîrmehê de li bajarê Lozanê ya Swîsreyê çêbûbû. Lozan, di dîroka gelê me de xwediyê cihê girîng e.

Ji lew re, bi peymanê Lozanê (24 tîrmeh 1923) welatê kurdan, Kurdistan di nava çar welatan de hate parîkirin.

Bi mebesta hînbûna dîtin û ramanên Öcalan ên li ser dîrok û xebatên li ser wê, me beşeke mezin ji mesaja wî wergerande zimanê kurdî û ji bo agahdarkirinê em wê diwêşînin.

Gelî beşdarên heja!

Beriya her tiştî, ji ber ku ez bawer dikim hûnê bi vî xebata xwe ya dîrokî bersiv bidine heqîqeta bêtarîxkirina vî gel û welatê kevnare, ji bo vî yekê ez we pîroz û silav dikim.

Hûn jî baş dizanin ku, cografyaya Kurdistanê wekî jêderka hejahiye mirovahiyê û şaristaniyê tê nixrandin. Bi rastî jî nêzîkahiyeke qayde û qanûnên ku ji bo mirovahiyê mîna hîm (xîm) tene pejirandin, bi qewmînen civakî yê ve herêmê re hene. Kî çiqas lê digere bila bigere, ewê bi wan hemûyan re bi eşkerahî derkeve holê ku feydeyeke mezin a ji ber îsrankirina li ser dîroka van axan hem ji bo mirovahiyê û him jî ji bo roja me heye. Lê çî heyf e ku hemû nixrê çandî, bernamêyên dîrokî yê ve herêma destpêka dîrokê, ji vî yekê jî heyftir, gelê ve herêmê li ber qetlîameke dîrokî ya bêaman e. Ez zen nakim ku qetlîameke çandî ya hovane û qedîner ku di şexsê gelekî herî kevnare de hatiye kirin, heta roja me di heqîqeta gelekî din de hatiye kirin.

Di vî navê de ez bawer dikim ku, alîkariya me karîbûye ji we dîrokzan re bikin, di vî qonaxa dîrokî de, li ser navê vî welatî, li ser navê vî nîjadê ku gelek deng daye û dikare bê gotin dîrok ji nû ve hatiye destpêkirin (vî tabîra min mehzur bibînin, bi rastî jî ev ji aliyekî ve wisan e), me ji we re kiriyê. Bi derxistina vî tevgerê, jixwe ev alîkarî hatiye kirin.

Bi derxistina vî tevgerê me alîkariya we dîrokzanan kiriyê

Dîsa jî hûn dîrokzan baş dizanin ku divê qet dev ji dîroka vî derê neyê berdan û divê ew dîroka ku bi mirovahiyê re dest pê kiriyê li şûna wê bê bicîhkirin. Ev ne tenê ji bo derxistina hîmê welatparêziya li Kurdistanê ye. Ev, ji bo hewcetiya lêgerînê ilmî ku ji bo pêşveçûna mirovahiyê tiştêkî jene-

ger e jî, muhîm e. Divê em Mezopotamyayê bi wê re, bi qewmînen li derdorên wê û tiştên ku hatine bidestxist baş izah bikin. Ev yek ji aliyekî wê bibe sebebê zelalbûna meseleyên sereke. Berê li ser navê vî welatî, vî gelî civînen wisa dîrokî, xebatên zanistî yê girîng nedihatî kirin. Her wiha em dikarin behsa ronansa di warê xebatên dîrokî de jî bikin, ku di gelek waran de jê tê behskirin û ev civîna ku hûn pêk tînin ji îzaheke vî yekê ya eşkera ye.

Zanyarên dîrokê nikarin bêdeng bimînin

Heke qetlîamek hebe û di şexsê gelekî de ev bi awayekî bêmerhamet hatibe kirin û heta roja îro hatibe meşandin, eşkere ye ku dîrokzan bi wezîfeyêke dîrokî ya mezin

çûn û destpêkirina vî dîroka mirovahiyê ku di şexsê gelê me de dest pê kiriyê, hazeke mezin dide min. Ez xwedî bawer im ku hûn jî dema lêgerînan li ser van sedsalan dikin bi vî yekê dihesin. Ji lew re hûn jî dinirxînin ku, tiştên hîmî yê ji bo pêşveçûna mirovahiyê pêwîst in mîna hiqûq, huner û ji gelek warên wê, siyaset, leşkerî û aborî, kedîkirina heywanan, îcadên teknîkî, hemû li ser van axan hatin kemilandin; heta hatine afirandin û bi heycaneke mezin hûn vî yekê diyar dikin.

Lêkolînên li ser dîrokê haz didine min

Ji ber van yekan ez xebatên we bi heycan dibînim û ez bawer dikim ku divê heta dawiyê ji wan feyde bê standin. Divê hûn jî, ji vî



Ji beşdarên Konferansa Dîrokê (ji aliyê çepê ve) Prof. Dr. Şakiro Mihoyî, Selîm Ferat, İsmail Göldaş, Prof. Dr. Lazarev

re rû bi rû ye. Ev li hemerî qetlîamê faalîyeteke bi rûmet, afirîner û fêrisî ye. Min divê ku ez çalakiyên we di vî çarçoveyê de binirxînim. Heke we bi rastî jî, bi alîkariya belge û destketiyan, dîroka vî gelî hinek ronî kiribe, ez bawer dikim ku qîmeta we mezin e, bi qasî ku zanistî ye ewqas şoreşger û heta mîna hunermendekî hûn di nava hewlan de ne.

Xebatên dîrokê, ji vî aliyê ve hem zanist (ilm) e, hem huner e û hem jî şoreş e. Ez di wê baweriyê de me ku, ew pêşveçûnên we yê di vî warê de pêşiya me ronî dikin. Li ser navê vî tevgera neteweyî eger îro ez ewqas dikarim alîkariya van xebatan bikim, ji we dîrokzan re ez vî dibêjim; ne ji xebatên dîrokê yê sedsala 19'an, belgeyên bisînorbûna, me nikaribû wiha biwêrin (cesaret) li vî gelî xwedî derketana.

Lewma dibêjim ku eleqetiya vî têkoşîna ku tê meşandin bi van xebatan heye. Ez dizanim ku ev bi tenê ne bes e, divê ku hûn bêhtir ronîkirin çêbibe, heta divê bê gotin ku pêwîst e dîroka hemû sedsalan ji nû ve bi awayekî kûr bê vekolîn û nivisandin. Divê ez diyar bikim ku ez tiştê jê haz distînim, dîrok e. Temaşekirina pêşve-

ewle bin ku, wê ev gel bijî û wê bi kira xwe ya mezin dîroka xwe ya ku hatibû binaxkirin derxe rastê. Dîrok heye, lê hatiye tunekirin. Dîtina wê dîrokê çiqas wezîfeya we be (bi giranî), ewqas wezîfeya me ye ku em bi navê wî gelî rabûne ser xwe. Loma pêdiviya me zehf bi hev heye. Em bêyî we nikarin bi rê ve biçin, hûn jî bêyî me nikarin bibin xwediyê xebatên bi-îdia.

Devera ku hûn civîne pêk tînin, di dîroka gelê me de xwediyê roleke bêyom e û destpêka bêdîrok-kirina gelê me ye. Niha hûn jî piştî, heftê salan zêdetir, bi vî kirina civîne, tewra xwe ya li pêşberî neheqiyê diyar dikin.

Ango hûn bi civîneke dîrokî bersiv didine hewlên ji bo bêdîrok-kirine; her wiha alîkariyeke pir heja jî didine û vî gelî. Ji ber vî yekê ez xwedî bawer im ku rûmeteke vî civîne heye.

Li ser vî yekê ez baweriyê xwe ya ku di rojên pêş de wê xebatên zanistî yê bilind di vî warê de derkevîne pêş, diyar dikim. Dîsa ez bawer dikim hûnê di demeke pir nêzîk de bi konferanseke dîrokî pêşiya me ronî bikin. Ez bi coşêke mezin silav li we dikim û hurmetên xwe pêşkêş dikim.

Yên berî me çî, çawa dinivîsandin

Ji dîroka rojnamegeriya kurdî

Nivîsek ji hejmara 30. a Kovara Hawar
Mêjû: 1941, 1'ê tîrmehê

DERDÊ MILETÊ ME

(Ez dibêjim), (Nema dikim)

Berî ko ez dest bi meqseda xwe bikim, ez dê çend pirsan ji bo brayên xwe yê ko li Sûriyê rûniştî bikim.

Gelî biran Hawar derket, gaziya miletê kurd. Heya karî be li Kurdistanê derkeve mehvanê we ye. Divê kurdên ko li Sûriyê rûniştî ne Hawarê bijînin; bi her hawayî alîkariya wê bikin ko karî be gaziya xwe bibe serî.

Derdê miletê me çî ye? Ew çîra heya îro ûsa maye? Bi min ev her du pirs bo me pir xedar in. (Ez dibêjim) çî ye; dema ko yekî ji me, ev pirs got tu dêbêjî qey ayeteke quranê ye; jê venage-re.

Mezin û piçûk xwenda û nexwenda giş welê ne. Gelî birano ma ne ûsa ye? ev pirsên te ne rast in, welê çênabe. (Ez dibêjim) xelas bû. Tu çî bikî feyde nîne. Pir caran heye ko ew baweriyaya xwe tîne ko fikra wî ne rast e, lê carekê (ez dibêjim) gotiye bi şûn da venagere.

Divê hêdî hêdî weke miletên din xwe hîn bikin ko veke wan em jî bêjin (em dibêjin). Kînga me vî yekê anî karê me bêtir dê bimeşe.

Ew jî çawa dibe? Kînga ko çend heval gihiştin hev li ser fikrekê xeber dan fikra ko li piraniyê de ma wê fikrê qebûl bikin bi dî piraniyê de herin. Heya îro çend civata kurdan çêbûne. Giş ji bo (ez dibêjim) ne çûne serî.

Gelî şêx û melan, mezin û xwendewarên kurdan! ev kêmanî di we di jî hene. We ewçend mal û milkê xwe, îstîqbalê xwe ji bo xelasa miletê kurd feda kir. Ma hon nikarin dev ji van du pirsan berdin? ji we dengê derkeve, kurdên nezan jî wê bidin dî we.

Pirsa din jî (nema dikim) e. Ev pir tiştêkî ecêb e; bi yekî re ser fikrekê xeber bidî; tucaran bê camêrî li te venagerine. Pir caran dengê xwe nake, meriv dibê qey fikra me qebûl kiriyê. Lê ne ûsa ye. Ji xwe ra riya revê çêkiriyê. Qenc hat; hevalê te ye; ne hat ne bi te re ye; ev dîsa ne tiştêk e.

Car heye bi her awayî hevalên hev, bi sondekê mezin ji girêdayiyên hev in û li ser fikrekê jî li hev hatine, lê saeta ko şîxul nêz dibe; divê dest bi karê xwe bikin; yek ji wan radibe dibêje (nema dikim).

Keko ûsa nabe, em hevalên hey bûn me sond xwari bû. Pir mevir hene ji vî rûyî dê bixesirin. Îşê miletekî ji bo viya dê bi şûn de bikeve. Tu çî bikî feyde nabe. Qîma wî nayê; dibê (nema dikim).

Eviya pir caran hatiye serê me. Ez jî şêx û melan, mezin û zanayên kurdmancan hevî dikim; bira bixebitin vî adeta nerind ji nav miletî rakin. Weke miletên din em jî xweyiyê pirsê xwe bin. Bira di şewrekê da rind bifikirin.

Heke pirsêke wan hebe wê gavê bêjin. Lê kînga ko soz dan serê wan jî here divê pirsê xwe bibin serî. Di mîranî û di camêriyê de weke miletê kurd kê mî pîyda dibin.

Dinê pê zane ku kurd weke şêr in; tucaran xwe ji mirinê nadin alî. Lê çî feyde tucaran ji gotina wan bi yek nabe. Em nikarin baweriyaya xwe bi hev binin piştî xwe li hev girêdin. Bo vî jî li bindestê biyaniyan da mane.

Heke em dixwazin bi ser xwe û xweyiyê we-latekî bibin divê em van tiştan ji nav xwe rakin. Kurdino destên xwe bidin hev ta ko em kari bin dilxwaza xwe bibin serî.

BEDRÎ CEMİL PAŞA

Berxwedanên birçîbûnê pêl bi pêl mezin dibin



Cenazeya şehîda duyemîn a berxwedana birçîbûnê Gulnaz Baxistanî li Berlinê bi beşdariya 35 hezar kesî ve hate hilandin.

Li çar hêlên dinyayê grevên birçîbûnê didomin. Ji Hewlêr heta Amedê, ji wir heta Edene, Îzmîr û Stenbolê, ji wir ber bi Atîna, Cenewre û Berlinê, ji wir heta Stockholm, Paris û Londrayê, ji wir ber bi Savya (Lîbya), Sidney û Washingtonê, bi hezaran kes di livbaziya aştiyê de mil bi mil in. Li hêla din li Stenbolê li Sultanahmedê bi hezaran kes, meşiyên. Bi dehan kes hatin birîndarkirin û girtin, ji aliyê din, di cenazeyê Gulnaz Baxistanî de (1'ê tîrmehê) 35 hezar kes li Berlinê meşiyên.

Gava di 14'ê tîrmehê de berxwedana birçîbûnê ya girtiyên PKK'yî dest pê kir, hin rojnameyên tirkî, di şîroveyên xwe de diyar kirin ku armanca wê livbaziya danasîna welatê kurdan, Kurdistanê ye. Hinekê ji wan jî, digotin çawa însanek heft roja tekeve greva birçîbûnê û dû re bimire?

Bi van gotinan wan didan nîşan ku di mirina Gulnaz Baxistanî de şuphe hene, bi gotineke eşkeretir, ew ji bo bibe malzemeyê propogandayê, hatiya kuştin. Gelo cidiyeta van îdiayan çiqas e? Cidiyeta wan bi qasî sozên Serokwezîr Tansu Çiller ên ji bo bicîhbûna demokrasîyê ye.

Nirxandin û şîroveyên dewlet û medyaya tirkî, îstisnâ ne tê de, bi wî rengî ne. Lê kurd jî rojeva xwe li gorî şertên xwe dibijêrin û nirxandina wan

cihêtir in.

Ji bo rewşa kesên ku di berxwedanan de em hîn bibin me li Stenbolê li HADEP'a navçeya Kadıköyê û li navenda Partiya Sosyalîst a Yekbûyî (BSP)'a Beyoğlu, der barê grevê û armanca wê ji beşdaran çend pirs kir.

Gelo hûn ji bo çî grevê dikin û çî dixwazîzin?

Mêrek- Ez dibêjim ku tirk û kurd birayên hev in û lazîm e ev xwîn êdî nerije. Bes e! Ew kesên ku tînan kuştin kî ne, gere ew bînan. Kesên ku mirine hemû zarokên me ne. An kurd an jî tirk in. Daxwaza me ya herî mezin bi hev re rûniştine, piştî wê rûniştinê jî peyman aştîyê ye.

Jinek- Em aştîyê dixwazî. Bila bê zanîn ku

di navbera 15 salan de gelek xwîn rijiyaye. Ev xwîn a zarokên dayikên kurd û tirkî e. Bila ev şerê gemar êdî raweste.

Li vir me xwest em fikrên wan ên li ser Peymana Cenewreyê hîn bibin. Ji ber ku herkes radi-be, rûdinê û qala Peymana Cenewreyê dike.

Zarokên we yê ku di girtigehê de ne, dibêjin bila Komara Tirk li gorî Peymana Cenewreyê hereket bike. Hûn ji wê peymanê çî fêm dikin?

- Zanîna me ew e ku zarokên me jî mîna leşkerên komarekê ne, heke hêzek ku kincên standart û çekên standart qebûl kir û şertên peymanê anîn cih, êdî ew hêz, resmî ye. Ji ber van tiştan jî lazîm e mafê wan hêsîran bînan

zanîn û bînan ber çavan.

Peyva aştiyê ji kurdan dîr ketiye. Gelo ji bo kurdan aştî tê maneya çî û çî ifade dike. De werin em bi hev re li bersiva kurdan mîze bikin:

Aştî wê kengî were, çiqas baweriya we bi hatina aştiyê heye?

- Ku Komara Tirkiyeyê neketa destên dînan, ev tişt belkî çênebûyana.

Lê baweriya tu kesekî bi dewletê re nema ye. Serhişkiya berpirsiyarên Komara Tirkiyeyê hem welatê wan, hem jî ya me xera kir. Êdî em dibêjin bes e.

Erê, êdî bes e. Ji bo besbûnê li Girtigeha Yozgatê Fesîh Beyazçîçek û li Berlinê Gulnaz Baxistanî mirin. Ji bo cenazeyê Gulnaz, 35 hezar kes li Berlinê meşiyên. Berî wê meşê

bi rojekê li Stenbolê, li Sultanahmedê dîsa bi hezaran kurd ji bo piştgiriyê meşiyên. Berxwedana ku di 14'ê tîrmehê de ji aliyê 10 hezar girtiyên ve hatibû destpêkirin, niha li çar aliyê dinyayê deng veda ye. Ji Hewlêr heta Amedê, ji wir heta Meletî, Semsûr, Riha, Edene, Mersîn, Antalya, Îzmîr, Stenbol, Atîna, Cenewre, Moskov, Berlin, Bonn, Stockholm, Paris, Londra, Savya (Lîbya) Sidney, Washington û gelek dever û bajarên dinyayê, bi dehhezaran kes beşdarî wê meşê, wê livbaziya bînan û hîn jî ew yek berdewam e. Navê wê çî dibe bila bibe, ew livbaziya ji bo sekinandin û bicîhbûna aştiyê, niyeta kurdan derxist holê.

Ez nas Maya
Cewdet Qûşman
Ercan Zengin
Suut Kılıç

PEYMANA CENEWREYÊ

Li Cenewreyê di 12'ê gelawêja 1949'an de bi navê Peymana Xaç Sor hate îmzekirin. Heta îro, 172 welat îmze avêtine binê wê peymanê. Tirkiye di 10'ê gelawêja 1954'an de ev peyman îmze kir, lê ji aliyê din ve îmze neavête binê protokala paşgo ya 1977/1. Ji ber ewlehiya neteweyî. Ev madde, bi tevgerên rizgarî yê neteweyî ve eleqedar e.

Ev peyman esas ji çar maddeyên hîmî pêk tê:

- 1- Hukmên der heqên tevgerên li dijî birîndar û nexweşan de, di dema operasyonên bejîyê de.
 - 2- Hukmên der heqê tevgerên li dijî birîndar û nexweşan de, di dema operasyonên deryayê (berê) de.
 - 3- Mukelefiyên der heqê dîl (esir) ên şer de
 - 4- Mukelefiyên der heqê parêziya sivîlan di dema şer de.
- Li ser navê Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan, Ali Sapan di 23'ê rêbendana 1995 (23.1.1995)'an serî li herdu saziyan xist da ku PKK jî wek aliyekî şer bê qebûlkirin û ji aliyê din ve jî PKK daxuyand ku ew rîayetî hukmên wan saziyan dike.

XAÇA SOR A NAVNETEWYÊ

Di 21'ê gelawêja (tebaxa) 1864'an de ji aliyê 16 welatan ve hate avakirin. Komîteya Xaç Sor a Navneteweyî herî zêde ji 25 Swîsrî (Îsvîçre) yan pêk tê û serbixwe dixebite. Xaç Sor û hevyên Sor ên mîletên din bi Xaç Sor a Navneteweyî ve ne û mîsyona aştiyê pêk tînin. Ev sazî xwediyê maf (heq) e ku çavdêrên xwe bixê Civîna Giştî ya Neteweyên Yekbûyî (NY), Komîsyona Mafên Mirovan a NY'ê û di Komîseriya Bilind a Penaber (multeci) an a NY'ê. Ji bilî civîna Konseya Ewletiyê ya NY'ê dikare tevî hemû civînan bibe. Di van demên dawî de ev sazî rexneyên tund û tûj li Heyva Sor a Tirkiyeyê girt.



Ji daxwaziya aştiyê re bersiva dewletê (Sultanahmet/Stenbol)

LI SER BERXWEDANÊ CEND GOTIN

Kurd ji bo aştiyê li ber xwe didin, ji bo ku çareyeke demokartîk û siyasî ji gelê kurdî re bê dîtin, bi deh hezaran kurd xwe birçî dihêlin. Pêşî dîlên PKK'yî ku hejmarê wan ji deh hezarî dibuhire di 14'ê tîrmehê de dest pê kirin. Li dû wan jî malbat û gel. Hem jî li cografîyeke pir fireh. Li hemû devêrên ku kurd lê dijîn.

Bi hêsanî dikare bê gotin ku heta niha tiştêkî wiha di tu demên dinyayê de neqewimiye. Ev livbaziyeke bêhempa ye. Li çar aliyê çihanê kurd bi têkoşîneke wiha humanîst daxwazên xwe radigihînin mirovahiyê.

Mirov dikare li ser 14'ê tîrmehê raweste, ka çima ev livbazî, ev berxwedan di vê rojê de li dar ket. Di dîroka gelê kurd de 14'ê tîrmeha 1982'yan, cihêkî zehf girîng digire, hem jî bi tevî Zîndana Diyarbekirê. 13 sal berê, li wê zîndanê, li hemberî hovîtiyeke ku kesî nedîtî û nebihîstî çar lehêngên mirovahiyê dest bi rojiya mirinê kirin. Ji Komîteya Navendî ya PKK'ê M. Hayrî Durmuş û Kemal Pîr, dîlên PKK'yî Akîf Yılmaz û Alî Çiçek. Ev kes bi vê kirina xwe, xwe di dil û bîra gelê xwe de bi cih kirin û tirs berdane nava dilê neyar û

kedxwaran.

Ev mirov ji bo ku di zîndanên de nasnameya xwe ya siyasî û neteweyî biparêzin, parêziya xwe ya siyasî bikin, dest bi tiştêkî wiha kirin. Belê ji bo bidestxistina wan mafan xwe bi gorî kirin. Gotin: "Berdêla her tiştî heye, berdêla me jî bedena me ye."

A niha jî, dîsa di roja 14'ê tîrmehê de bi deh hezaran kurd, hem ji bo bîranîna wan xweşmêran û hem jî, ji bo çarekirina meseleya kurdan xwe birçî dihêlin. Dest bi berxwedana birçîbûnê ya bêmuhtel û dorveger dikin. Heta dadixuyînin ku daxwazên wan nehêne cih wê livbaziya xwe dagerînin rojiya mirinê. Biryardar in, çî tiştê ku gotine û dane pêşiya xwe pêk anîne.

Divê mirov herdu berxwedana bide ber hev, ka di dîroka vî gelfî de çî îfade dikin. Berxwedana pêşîn a 1982'yan ji bo vejînê û ya niha jî (1995) ji bo rizgariyê ye. Di ya rizgariyê de heta niha du canan serê xwe danîn û hewl û kêferatên ji bo çarekirina doza kurdî xurt kirin. Kurdan tev biryarên xwe dane, ji mirinê re çavan naniqînin. Hemû dilketiyên azadiyê ne. Ev yek îspat jî kirine.

M. RONAK

'Li hêviya kodikxerakinê nesekinin'

Girtiyên PKK'yî ji 14'ê tîrmehê û bi vir ve, li zîndanên dest bi berxwedana birçîtiyê kirine. Yek ji daxwaza girtiyên ew e ku ew wekî hêsrên şer bînin qebûl kirin. Di nav daxwazan de sekinandina şerê ku dewleta dagirker li Kurdistanê diajo, şewitandin û valakirina gundan, hene. Ew dixwazê in ku gelê sivil neyê kuştin û zerar nebîne, di şer de li gorî esasên Peymana Cenewre bê hereketkirin, û aştî pêk bê, ji doza kurdan re çareyeke siyasî bê dîtin.

Piştî ku girtiyên li zîndanên dest bi berxwedana birçîbûnê kirin, malbat jî di nav de, bi hezaran însan ji bo piştgiriyê dest bi livbaziyan kirin. Ev livbazî bi giranî li HADEP, Komeleya Mafên Mirovan (İHD), Partiya Sosyalîst a Yekbûyî (BSP), Hereketa Demokrasiya Nû (YDH), li sendîkaya DİSK'ê dewam dikin. Malbat û gel zêdetir dixwazin şer bisekine, lewre ew dizanin heta şer nesekine, aştî jî çênabe. Aştî nebe, ew heqê ku tê bahskirin jixwe ne mûmkûn e. Di van livbaziyan de du tiştên xuyakirin:

- 1-Rewşa dewletê.
- 2-Rewşa gelê kurd.

1- Rewşa dewletê nîşan dide ku daxwaza malbatên kurdan wê eleqedar nake. Her çiqas malbat dibêjin, bila diya leşkeran û ya gerîlayan negirîn, ne leşker ne jî gerîla neyên kuştin, bila aştî bê, şer were sekinandin jî, armanca dewletê tiştêkî din e. Lewre ew hebûna kurdan qebûl nake.

Li Sultanahmedê roja yekşemê (31 tîrmehê) kesên ku di greva birçîbûnê de bûn, meşek çêkirin û sloganên wan li ser biratî û aştiyê bûn. Heta belavbûnê jî polîsan tiştêkî negot, lê piştî ku ew belav bûn, polîsan bêheq û bêsebeb êrîş dane ser meşvanan û bi dehan însan birîndar kirin, bi dehan jî girtin. Gelo sebaba vê çî bû? Sebeb, neheqî û zordestiya zilma dewletê bû. Wê dewleta ku bi hezaran gundê kurdan şewitandibûn û kurd ji welatê wan xistibûn der, niha li Stenbolê jî zilm dikir. Lê kurdên ku hatibûn Stenbolê, digotin: "Va ye em dîsa hene." Serokê polîsan di hoperlorê de gazî dikir û digot: "Belav bibin, ku hûn belav nebin emê we bi zorê belav bikin, dewlet biqewet e". Dema wî ev anons dikir, meseleyek hate bîra min: Hirçekî li mirovekî dabû û ew ker kiribû, kê çî digot wî mirovî digot, qey her kes qala hirç dîke. Wî jî dest bi axaftinê dikir û digot, "Hirç heywanekî zexm e û serdest e." Serdestî û zexmiya dewletê, mîna wî hirçê wehşî û hovî ye û ne medenî û însanî ye. Lewre ji êrîşa dewletê ya li ser zarok û jinan jî dihate xuyakirin. Esas ev livbazî jî wan re bû mane, ji ber ku li Sağmalcılarê, li deriyê metroyê û li Cadeya İstiklalê meşvan bi zanîn û sergiraniyeke însanî û medenî meşa xwe temam kiribûn, dewlet jî ji vê pir aciz bûbû. Di vê meşê de dewletê dixwest tevliheviyekê çêbike ku vê livbaziyeke bi nebaşî bide nîşandan. Di



İshak Tepe

vê êrîşa Sultanahmedê de dewletê tiştê dixwest, bidest nexist.

2- Rewşa malbatan û ya gelê kurd. Jixwe malbat dibêjin: "Em heyranî mirinê bi zariyên xwe re ne" û vê dibêjin, "Ew li me bidin, me bikujin jî, em êdî natirsin. Qey em ji zariyên xwe heyftir in. Ew bi ciwaniya xwe û bi sebebên doza me li zîndanên bin, her hal em jî êdî li pey kêf û zewqê nagerin, em ji her tiştî re hazir in, ji mirinê re jî hazir in."

Gelê kurd, hinek tirsonek û bêxîret ne tê de, wisa nîşan dide ku êdî roj bi roj tê ser hişê xwe û bi doza xwe-dihese.

Piştî meşa Sultanahmedê li İHD'ê kurdekî birîndar, ji medyayê re ev digot, "Em li welatê me nestirandin. Gundê me şewitandin, em kuştin, em muhacir kirin, bêmal û bêwar kirin, ma êdî em çawa bisekinin. Em nasekinin û êdî dev ji doza xwe bernadin. Heyanî bi azadî û bi serkeftinê nezivirin ser axa xwe û welatê xwe, emê mucadeleyê bikin." Dema wî kurdî ev gotin ji medyayê re got şîra Cegerxwîn hate bîra min.

Kurdîstana delalîm,

herkesê tê min dixwazî

Pir bi şûx û şepalîm,

min deng daye bi nazî

Ev bû bîst û du sedsal,

li ser min ceng û bazî

Kurdo! Were min bixwaze,

belê bi serfirazî

Ev kurdê birîndar, ku bi serfirazî, serbilindî û bêtirs dawa doza xwe dike, min dît û êdî ez pir pê kêfxweş bûm. Lê hinekên ji xwe re dibêjin zana û xwe vedîşêrin jî hene an jî hinek xwenda ku ji xwe re "aydin" (Ronakbîr) dibêjin, xwe li para disekinîn û dibêjin em bi we re ne. Gotineke min ji wan re jî heye. Ew hirçê hov ku dixwaze me bixwe, paşê wê wan jî bixwe, bila ew xwe nexapînin. Rojêkê du bira di rêyekê de diçin, şev li wan tarî dibe. Ji xwe re li ser kaniyekê agir hil dikin. Birayek ji wan jî heriyê kodikekê çêdike. Hirçekê tê wan. Birayê rûniştî û hirç xwe li hev didin û bira gazî birayê ku kodikekê çêdike, dike û jê re dibêje: "Were hirç ez xwarim." Birayê din lê vedigerîne û dibêje: "Yê kodika min xera bike, ezê lêxim."

Birayê din dibêje: "Gava hirç ez xwarim wê te jî bixwe, were nesekine." Lê yê din qet di eynê xwe dernaxe. Birayê ku bi hirç re şer dike, mecbûr dibe pê hirç dişemîtine, li kodika wî dide û xera dike. Paşê re bira radibe û alî birayê xwe dike, bi hev re li hirç didin û xelas dibin. Ez jî dibêjim Li hêviya kodikxerakinê nesekinin. Ji ber ku ne kifş e çawa dibe.

Gerîla li cografyayeke fireh êrîşên xwe didomînin û gelek ziyan didine dijberî xwe Livbazyên li hemberî leşker û cerdevanan zêde dibin

Li gorî agahî û saloxiyên ku me bi alîkariya ajans û çavkaniyên herêmî bi dest xistine, di livbazyên gerîlayan de zêdebûnek tê dîtin. Di van lihevxiştin û şeran de gerîla gelek ziyan dane hêzên dewletê û cerdevanan.

Ji aliyê din ve, gerîla herêma xwe ya ku livbazyên lê pêk tîne, fi-rehtir kiriye.

25.7.1995

Bi elenda (şefaqa) sibê re hêzên gerîlayan li gundê Textê ku bi ser Motkê ve ye, êrîşekê dibin ser hêzên dewletê û di encama şerekî dijwar de ziyanên mezin bi hêzên dewletê dikevin.

Hêzeke dewletê li de-vera Şaxê (Çatak), li Çiyayê Begê dikeve buseyeye gerîlayan û di encama şerekî kurt de, li dûv ragihandina çavkaniyên binecihi, uzman çawûşek, 2 leşker û 2 cerdevan di vî şerî de tene kuştin.

Li devera Qeşûriyan hêzên gerîlayan êrîşî ser girê Elemûnê dikin û her di destpêka şer de 4 leşker dimirin û gelek jî birîndar dibin.

Hêzên gerîlayan li de-vera Haftanînê êrîşên xwe berfireh dikin û li vê deverê ziyanên mezin didin hêzên dewletê.

Li navçeya Şemzînanê hêzên ARGK'ê cerdî ser sengerekî qereqol polîsan dikin û di encama şerekî dijwar de, digel rûxandina sengerê polîsan, zerîpoşeke (panzer) leşkerî bi tevahî tê sotin û yeke din jî, gava ku ji ber moşekên (roket) gerîlayan direve, tê wergerandin û infilaq dibe. Ziyanên dewletê yê di vî şerî de nehatin zanîn.

Her di vê rojê de, di encama peqîna mayînekê de li ser rîya Geverê û Oremarê zerîpoşek bi tevayî ji hev di- perçeve.

Li devera Çiravê (Botan) hêzên dewletê li du cihan bi ser buseyên gerîlayan hildibin û di encama şerekî dirêj û dijwar de 7 leşker dimirin.

Her di vê rojê de jî li danê êvarê hêzên gerîlayan bi ser navçeya Dihê de digirin. Di encama vê êrîşê de 4 leşker dimirin. Li nêzikî gundê Avalê di

encama peqîna mayînekê de 2 leşker birîndar dibin.

Hêzên ARGK'ê êrîşî ser 2 gundên cerdevanan Gerdê û Gulkan dikin. Di encama vê êrîşê de 3 cerdevan dimirin.

26.7.1995

Hêzên gerîlayan êrîşeke tund dibine ser sengerê Binehê (li Herêma Botan) û bi çekên giran li vî sengerê dixin. Di demeke kurt de, ne bi tevayî tê rûxandin. Ji çavkaniyên binecihi hate zanîn ku ziyanên dewletê gelek zêde ne û termên gelek leşkeran li ser axê hatine dîtin û leşkerên ku sax dimînin sengerê xwe berdîdî û ji devera şer direvin.

Hêzên ARGK'ê bi ser gundê cerdevanan Gezhatê de digirin û di encama şer de 7 cerdevan tene kuştin, 5 jî birîndar dibin. Di vê navberê de zerîpoşeke leşkerî li he-wara cerdevanan tê û ew jî bi ber agirbaran gerîlayan dikeve. Di dawiya vê agirbaranê de zerîpoşek tê wergerandin, digel serleşkerêkî 4 leşker jî dimirin. Di vî şerî de 3 gerîlan jî bi navên Ciwan, Merwan û Jiyan tene kuştin.

Li navbera du gundên Omeriyan (Sadê û Kermête) hêzên gerîlayan êrîşî ser tîmekî taybet dikin. Li vir jî 2 leşker dimirin. Leşkerên ku li deverên Kercews, Midyad û Stewrê derketibûn operasyonan, li vegerê bi ser buseya gerîlayan hildibin û di encama şer de 3 leşker tene kuştin.

Li devera Îskenderûnê şantîyeye Demir-Çelikê jî layê gerîlayan ve tê desteserkin û piştî kontrolkirina nasnamiyên karkeran faşîstekî MHP'yî tê cezakirin û yê mayî tene azadkirin. Di navbera hêzên ARGK'ê û yê dewletê de li navbera Hezro, Farqîn û Pasûrê şerên dijwar rûdidin. Hate zanîn ku di van şeran de 3

leşker mirine û 2 gerîla jî, ji refên xwe qut bûne û heta niha der barê van de tu saloxî bi dest neketine.

Li zozanên Doxanşehîrê (Meletyê) di encama şerekî kurt de 3 leşker dimirin, 2 jî birîndar dibin û gerîlayek jî tê kuştin. Di encama peqîna 2 mayînan li navbera gundê Durê û Demanê (Şemzînan), digel tîkçûna cibeke leşkerî, usttymenek, doktorek, 3 leşker û 2 cerdevan dimirin û leşkerek jî birîndar di-

dest bi zordariyê li ser cemawerê bêdesthilat dikin. Li ser vê yekê dîsa di navbera hêzên gerîlayan û yê dewletê de li Zeytîntepeyê şer derdikeve. Di encama vî şerî de hate zanîn ku digel kuştina 6 gerîlayan, gelek polîs û tîmên taybet mirine.

Di rûdana şerekî di navbera hêzên gerîla û cerdevanan de, li navbera gundê Herzok û Musakê (Behdînan), gelek cerdevan tene kuştin. Li devera Hebisbînê û li

29.7.1995

Hêzên gerîlayan afret (jin), li derveyî navçeya Xolxola (Yayladera) Çewlikê êrîşî ser binkeke hêzên dewletê dikin. Gerîlayên afret di demeke kurt de çeperê leşkeran ji wan distînin, 2 leşkeran dikujin û yê din direvin. Gerîlayên afret 1 MG3 jî ser termê leşkerê digel xwe radikin û bêziyan ji devera rûdanê bi dûr dikevin.

Li devera Heftanînê hêzên ARGK'ê êrîşî ser çend binecihi hêzên

û cerdevanan de nakokî peyda dibin. Li vê deverê gelek cerdevan çekên dewletê datînin. Li dûv pêzanînên ku gihiştine me, li devera Şemdînan 27 xêzanan (aîlan) çekên dewletê danandin û koçberî Başûr bûne. Li devera Sasonê hêzên gerîla êrîşî ser gundê cerdevanan, Sarika kirin û di encama vê êrîşê de 7 cerdevan hatin kuştin.

Li navbera Sason û Êlehê hêzeke mezin ya dewletê, bi ser buseyeye gerîlayan heldikeve. Di encama agirbarana gerîlayan de bi çekên sivik û giran zîleke leşkerî ji hev tê perçivandin, 3 jî bi tevayî ji kar dikevin. Her wisa hate zanîn ku di vî şerî de 18 leşker mirine.

Hêzên ARGK'ê li de-vera Seresêvê (Botan) êrîşî ser hêzeke dewletê ku ji tank û zerîpoşan pêk hetibû dikin û di encama şerekî dirêj de 2 tank tene binbirkirin û tankek jî ji kar dikeve.

30.7.1995

Hêzên ARGK'ê di navenda navçeya Mezgirê (Dêrsim) de, bi moşek û çekên giran êrîşî ser avahiya leşkerî dikin û di encama vê lêdanê de, ev avahî bi tevayî tê sotandin.

Li navenda bajarê Bilîsê, di encama êrîşa gerîlayan de ya li ser sengerê polîsan, hate zanîn ku 5 polîs mirine û gelek jî birîndar bûne. Her li vê deverê hêzên gerîla bi ser alaya cendirmeyan û lojmanên parêzgehê de digirin. Ji çavkaniyên gerîla hate zanîn ku ev êrîş, ji bo bîranîna Şehîdên Dehhezaran Fesih Beyazçîçek û Gulnaz Baxistanî hatine kirin.

31.7.1995

Hate zanîn ku piştî topbarankirina Alaya Çelê (Çukurca) ji layê gerîlayên ARGK'ê ve, agir bi avahiya alayê ketiye û gelek kuştî û birîndarên hêzên dewletê hene. Di encama êrîşeke gerîlayan bi ser sengerê Awnikê (gundekî Çewlikê) 2 leşker tene kuştin.

Cerdevanên gundê Zerikan (Çewlikê) jî layê gerîlayan ve hatin ji çek-kirin.

Kurd-A/Welatê Me



be. Di navenda navçeya Farqînê (Silîvan) de hêzên gerîlayan bi çekên giran û yê sivik êrîşî ser lojmanên subayan kirin û di encamê de ziyaneke mezin bi xaniyên wan dikeve û piştî vî şerî ev lojman bi tevayî hatine valakirin. Li navenda nehyaya Çanê hêzên gerîla êrîşî ser bineciheke leşkerî dikin û di encama vî şerî de hate zanîn ku 2 leşker mirine. Li Çiyayê Cûdî li ser Girê Zêringerê hêzên gerîla êrîşî ser bineciheke leşkerî dikin û di encamê de 5 leşker dimirin.

Li navenda Geverê (Yuksekov) gerîla cerdî ser bineciheke leşkeran dikin, 7 leşker tene kuştin û zerîpoşek bi moşekan ji hev tê perçivandin. Digel rakirina 1 MG3, 5 G3, 1 B7 û keleşkofek, hêzên gerîla bêziyan ji devera şer bi dûr dikevin.

gundê Mitirbê di navbera gerîla û hêzên dewletê de ku ji leşker û cerdevanan pêk hatibûn, şerekî dijwar diqewime û di vî şerî de 7 cerdevan dimirin û 2 gerîla jî bi sivikî birîndar dibin.

28.7.1995

Li Çiyayê Morê (Ge-verê) leşkerên ku ji bo operasyonan derketibûn herêmê, li Newala Mamsilo dikevin buseya gerîlayan. Di encama vî şerî de gelek leşker tene kuştin û birîndar kirin. Her wisa termê 6 leşkeran ji layê gerîlayan ve tene dîtin.

Li navenda Geverê (Yuksekov) gerîla cerdî ser bineciheke leşkeran dikin, 7 leşker tene kuştin û zerîpoşek bi moşekan ji hev tê perçivandin. Digel rakirina 1 MG3, 5 G3, 1 B7 û keleşkofek, hêzên gerîla bêziyan ji devera şer bi dûr dikevin.

dewleta tirk dikin û di encama van êrîşan de 2 leşker dimirin û yek jî birîndar dibe.

Li herêma Morê (Ge-verê) di navbera hêzên dewletê û yê gerîlayan de, peyapey şerên dijwar rûdidin. Li dûv pêzanînên ku ji çavkaniyên binecihi bi dest me ketine, hêzên dewletê digel piştevaniya hêzên asmanî jî, di van şeran de ziyanên mezin dane. Li dûv daxuyankirina van çavkaniyan, termên 2 subayan û yê 9 leşkeran hatine dîtin û 3 leşker jî birîndar bûne. Her wisa gerîlayek bi navê Behzad hatiye kuştin û 3 jî birîndar bûne.

Li devera Omeriya (Mêrdîn) leşkerên bi ser sengerê Herbê ve, di encama şaşiyekê de bi hev dikevin û di vî şerê wanî xwe bi xwe de subayek dimire û 2 leşker jî birîndar dibin.

Li devera Midyadê di navbera hêzên dewletê

Şuwênî zimanî kurdî lenêw xêzanî, zimananî Hînd û Ewrûpî da

Zimananî gêtî be çend binkeyekî destûrî zimanewanî da beşkirawete ser çendîn xêzan, le wane xêzanî zimananî hindû ewrûpî, xêzanî zimananî çînî û tibetî xêzanî zimananî malay û polînîzî, xêzanî zimanî japonî, xêzanî zimananî samî, xêzanî zimananî pantûyî.

Zimanî kurdî le rûy yasay zimanewey degerêtewe ser xêzanî zimananî Hind û Ewrûpî, ke ewîş çend komele zimanêk degrete xoy (birwane nexşey jimare -1-) Zimanî kurdî lenêw em komele zimanane da ser be girûpî zimananî Hînd û Êranî

(birwane nexşay jimare -2-)

Eger berawirdêk lenêwan zimanî kurdî û zimananî hawçerxî di Êranî bikeyn, dibînîn le gel ewey geranêkî zor beser zimanî kurdî da le rûy ew mêjûwe drêjey pêya têperîwe hatûwe, belam le heman katlda zor şewey rêzimanî û wuşey ferhengî way parastûwe ke le ziman û diyalêktekanî konî Êranî nêzikî dekatewe.

Zimanî deselatdaranî kurd le turk û ereb û fars neyan tûwanîwe karbikene ser destûrî zimanî kurdî, belkû karîgeriyan her le rûy wuşewey bûwe.

Zimanî kurdî le rûy

taybetêti fonolojî, morfolojî, sintaks û wuşey ferhengî be ciyawaz le zimananî di Êranî da perey sendûwe, bo ye be zimanekî serbexoy girûpî zimananî Êranî dandrawe.

Kontirîn şewey wuşey kurd lenêw nûsrawanî mêxî da le şewey (mat kurda ki) da bûwe, ke bo hezarey sêy pêş zayîn degerêtewe, wuşey (mat) sumerî ye û watay herêm, hewargê, niştiman degeyenêt û (-ki) nişaneyekî sumerî ye û watay zewî bexşîwe, ke lew kate da bakûrî rojhalatî Sûriyey emroy girtibûwe.*

*Bo zanyarî zêdetir

birwane

Groneberg B., Répertoire Géographique des Textes Cunéiformes-3. Wiesbaden. 1980

Khaled Nashef. Répertoire Géographique de Textes Cunéiformes-5. Wiesbaden. 1982

Dr. Cemal Reşîd. Peydabûnî Kurd le mêjû da (destnûse)

**Bo zanyarî zêdetir birwane

1. Nynke Mulder. Klankveranderingen, Groningen. 1992


2. Weijnen A.A. Met Schema Van de Klankwetten. Assen. 1970

DR. KURDISTAN MUKRIYANÎ

nexşey jimare 1.



nexşey jimare 2.



DEFTER

Remo û Temo

Temo: Roj baş bira. Kuro, tu li ku bûyî? Ev çend roj in tu winda yî.

Remo: Min lêkolîn çêdikir.

Temo: Lêkolîn?! Te çi dikola Remo?

Remo: Min der heqê rojnameyên kurdî de lêkolînek çê dikir.

Temo: Eh?! Tu çiqa pê ve çûyî, te çi dît û çi nedît?

Remo: Yekem, navê "rojname" ji bo wan ne navekî di cih de ye, ji ber ku ew heftename, mehname, yan her-çend-mehan-carekname ne. Duyem, gelek ji wan ne rojnameyên kurdî, lê rojnameyên bi navekî kurdî, yan rojnameyên li ser siyaseta kurdî ne.

Temo: Navên wan çi ne?

Remo: Kuro, ma em ewrûpî ne ku tu pirseke wisa ji min dikî? Nav-mavan ji min nepirse. Ji bo yê dizanin jî hewceyî navan nake.

Temo: Eh, de bavo, tu lêkolînan çêdikî, lê navan nadî, de ev çi ye?!

Remo: Em wekî hinan nebêfêm in, lawo! Em bênav jî têdigihên.

Temo: Baş e. Netîceyên din yê lêkolîna te çi bûn?

Remo: Encama sêyem ew bû ku rojnameyên me di dohnê kurdî di diqewirin diqelin.

Temo: De ev îcar çi ye, bavo? Yanê çi?

Remo: Kuro, ma tu li bajarên Tirkiyeyê mezin bûyî? Ma ezê te fêrî kurdî jî bikim!! Yanê: Tenê haya wan ji teqereqa kurdan heye. Ne haya wan ji siyaseta cihanê heye, ne jî pêşveçûna teknolojiyê, ne jî gelsên erdê em li ser dijîn, ne jî zanyariya gerdûnî. Tu dibêjî qey tenê teqereq heye li cihanê û ew ji bo me û nişên li pêş têrî hertiştî dike. Heta eger nivîskar behsa nexweşiyê wekî AIDSê jî bike, tête gotin. "De ev çi bêterbiyatiya vî kesî ye ku ji me re behsa nexweşiyên qûnek-mûnekan dike."

Temo: Yanê, tu dibêjî qûndeyên me jî hene?

Remo: Himm, wele, êh, himm êh ev nexweşiya ne tenê ya qûndan e (bila homoseksuelên birêz yê cihanê bibexşînin û deriyên dadgehan li me venekin; me çi mebesteke xerab li dijî

wan nîn e) Mirov dikare bi gelek şeweyên din jî pê keve, looo.

Temo: Çi encamên din yê lêkolîna te hebûn?

Remo: Encama çarem ew bû ku rojnameyên bi zimanê kurdî çavên gelek kesan diêşînin.

Temo: Qesta te hikûmet e.

Remo: Mebesta min ne tenê karbidest in, lê herwiha kurd bi xwe ne jî. Çavên hindekan ji wan jî diêşin.

Temo: Çima ev?

Remo: Ji ber ku tîpên î û ê gelekî dijwar têne xuyakirin. Niha hemû zimanzan û rêzan û zanezanên kurdan li çareyekê digerin ku çawa mala î û ê wêran bikin. Dibêjine ji rûyê wan xwendina bi zimanê kurdî eware bûye.

Temo: Wekî din?

Remo: Encameke din ew bû ku li gor hinan, xwedî û karmendên rojnameyên kurdî ji ber xwe ve şerm û fedî nakin.

Temo: Ev çima, lo?!

Remo: Kuro, dibêjinê, ma şerm nakin, ji xelkê pereyan dixwazin?! Di nav me kurdan de firotin şerm e. Eger dikin rojnameyê derxin, bila bêyî pere belav bikin, bi gotina wan.

Temo: Lê ew feqîran wê mesrefê xwe ji ku binin?

Remo: Dibêjine, eger tu nikarî mêvanan xwedî bikî, odeyan jî veneke, dibêjine, ewqas pere ji bo xwendina Qurani Kerîm jî nehatiye dayîn.

Temo: Ha! Tu nabê ji bo vê yekê ye ku rojnameyên kurdî heftiyê carekê, mehê carekê, yan çend mehan carekê têne der. Eger her roj bêne der, kî dikare wan bikire, bavê min?! Belkî çend mamosteyên me yê li derve û hew.

Remo: Rast e, ne wisa? Û ji ber ku pere nîn in nivîskar jî kêman û ji ber ku nivîskarên zana kêman in, em ê her di dohnê xwe de biqewirin.

Temo: De çawa be, elhemdûlillah, niha televîzyona me heye. De maşalah êdî ew jî pereyan naxwazin. De bila dema te xweş be, Remo.

Remo: Ya te jî geş be. Ta cara dahatû Temo-can.

ŞAHÎNÊ B. SOREKLÎ

Bi hêrs bişkoka televizyonê girt, çend dijûnên xerab kir. Got: "Hûn mala xwe xera dikin. Her şev hûn van derewan dikin. Heke ev gotin jî rast bûna, niha yek jî gelê min nemabû." xwarina xwe ya li ser sifreyê nivco hişt û bi qar jî odê derket der. Bavê wî bi şûn de pit pit kir. Digot:

-Ku dewlet jî we di kuje li xweşiya we naçe. Hûnê bi çavê xwe bibînin dê çi were serê we. Qey hûn dikarin bi dewletê re serî derkevin. Sêwiyên wekî we yên ku têr nan naxwin li ber dewletê radibin. We hê eskerî nekiriye. Qey top û firokeyên we hene? Dewlet incex dikarin bi dewletan re şer bikin.

Diya wî xwarin jî erdê rakir û jî aliyekî ve jî gote zilamê xwe:

-Mêriko nekeve qirika vî kurikî, çiqas tu jê re dibêjî, ew hê bêhtir tûj dibe. Berî sê rojan keça mala Hefsedê giha wan ên li çiyê. Zeman xera bûye, Xwedê hefza mirov bike. Xortên vî zemanî hew bi ya dê û bavê xwe dikin. Pozê xwe dikin nav kitêb û rojnameyan. Ez nizanîm çi di wan de heye. Dixwînin û hey dixwînin, çavên xwe pê kor dikin.

Mehsûm bi vê qarê jî malê derket, serî di ber de riya qehwexaneyê girt. Gote xwe: "Ez herim hinekî bi bilardo bilîzim, belkî ez xwe jî bîr bikim, jî pitepita van xelas bibim. Ev çend sal in ku dijîn, çi jî jiyana xwe fêr kirine, limêj û rojî; heye nîn e ew e."

Havîn, li van deranerdê dike wekî hêtûnan. Sincirandîna erdê, li dev û rûyê mirov di xe. Tava rojê rûyê mirovan diqemirîne. Rûyê karkerên ku li ser zeviyên pembû dixebitin, dibe wekî yên ku li ber deryayê xwe didin bertavê. Roj wilo mirovan dişewitîne ku mirov dibêje qey xwe didin bertavê. Mirovên vir her gav xwêdana xwe paqij dikin û dibêjin.

-Haho ma çiqas germ e?!

Li gorî bi rojêvar hênîk in. Bayê ku jî çiyê, xwe di nava newalê re berdide, nava mirov hênîk dike. Lewma qehweyên navçê, ha-



ÇÎROK

ŞEVEKE HAVÎNÊ

vînê jî xwe re bêxçe vedikin, mase û kursiyan derdixin nava bêxçe. Dema ku dibe ber êvarê, garson hewşa qehwê şil dikin, gulana û mêtûn û tûyan av didin. Şênî ku şivê dixwin, riya qehwê digirin. Hin bi okey, hin bi îskambîl hin kişik û hin bi tewlayê hin kal jî bi damayê dileyîzin. Li ser maseyan jî sohbet tê kirin.

Mehsûm, hezar carî di vî derî re ketibû hundirê vê qehweyê, lê hê jî dema ku diket hundir, fedî dikir. Wî digot qey dema ku dikeve hundir, çavên herkesî li wî ye. Çar çav dibû. Dema çavên wî li maseya hevalên wî diket, bi lez berê xwe dida cem wan. Îşev dîsa wekî dizekî şevê kete hundir, rahişt kursiyeke û li teniştê Azad rûnişt.

Azad li hevalên xwe yên bi okey dilîztin, temaşê dikir. Dema ku çav li Mehsum kir, pir kêfxweş bû. Gazî garson kir Got: "Ka çayekê ji me re bîne"

Li halê hev pirsîn. A-

zad got: "Çima ku êvarê mişterî pir in ji kêfa ew e ku Beşo ji kêfa nalîze, zaf hez ji pereyan dike". Mehsum got: "Çaya wan jî nayê vexwarin, sar bûye." Çay nivco hişt.

Azad guman kir ku Mehsum mitala dike. Bi zorê gotin jî devê wî derdiketin. Got: "Mehsum xêr e, kêfa te ne li te ye?" Azad çiqas pirsî encamek jê nestand. Dawiyê Mehsum got:

-Em herin ser wê maseya vala. Em hinekî jî xwe re biaxivin. Ma ev çi şeşşeşan dike, wele êş kete serê me.

Her du heval çûn, li binê kolikê rûniştin. Dengê sîsîrkan, çepeçepa pelikan, fikîniya kenê yên ku di listikê de bi ser diketin, tevlihev dibûn.

Bêhna axa ku av lê hatibû reşandin, dihat pozê mirov. Ji dûr ve dengê reyîna kûçikên tixûb, wekî nalîna birîndarekî xedar dihat guhê mirov.

Mehsum bang kir garson:

-Kengî çaya teze der-

ket ji me re du heban bîne.

Garson, zef hez ji wan dikir, maseya wan paqij kir. Surahiyek avas danî ser maseyê, got:

-Ser seran abê (keko). Ezê çaya teze ji we re bînim.

Dema garson jî ba wan çû, Azad got:

-Dê bibêje Mehsum, bi Xwedê îşev derdekî te heye. Ma tuyê jî min veşêrî?

Mehsum kir ku dest bi axaftinê bike, dît ku çend polîsan da der, got:

-Dîsa ev kûçik hatin. Di hefteyê de sê çar caran neyên, xewa wan nayê.

Bêhemdî xwe, destê xwe avêt bêrika xwe ku cuzdana wî di cih de ye. Dilê wî rehet bû, got "Baş e!"

Qomserên wan got:

-Herkes destên xwe deynin ser serê xwe. Nasnameyên xwe deynin ser maseyê. Bila kes xwe tev nede.

Yek bi yek li nasnameyan nêrîn. Pênc heb ji nav wan veqetandin,

Bi xwe re birin. Dengê egzoza otomobîla polîsan mêjiyê mirov dileqand. Dûyek reş li pey xwe hişt. Kesên di qehweyê de qasekê bêdeng man, hinekan cixare vêxistin. Ji bo hinekan tama listikê nema. Hewl dan ku dev jê berdin, herin mala xwe.

Mehsum, cixareke Winston ji bêrika xwe derxist. Ji cixarê dûyek kişand nava xwe. Dest bi axaftinê kir:

-Di mal de bavê min bi serê min de pitepîtê dike. Em tene qehweyê ev se, belaya xwe ji me venakin. Tu kar jî nîn e ku bixebitim. Bêhna min pir teng e. Ez bi ku ve herim. Carinan difikirim ku herim Stenbolê.

Azad, guhê xwe dabû wî, jî aliyekî ve jî bi tizbîha xwe dilîst. Mehsum axaftina xwe berî Azad got:

-Derdê me hemûyan jî wekî yê te ye. Lê divê ku em bisebr bin. Em ne wekî xortên tolaz in. Bêhtengî jî me re nabe, tu dizanî dê û bavê me dibistan nexwendine,

ew nikarin dinyayê rind şrove bikin. Divê em ya rast û baş bi tevgêrên xwe nîşanî wan bidin. Demekê ez jî wekî te difikirim, lê kengî hevlekî weşanin wilo dane min pê re, hiş û remanên min hatin guherîn, tu bixwazî ez ji te re bînim.

Her du heval li ser gelek tiştên din jî axivîn. Hingî dîtin ku çar-pênc kes di qehwê de mane. Gotin, bûye derenge em rabin herin mal.

Berî ku jî hev veqetin, Mehsum got:

-Bira tu weşanan jî bîr nekî. Xatir jî hev xwestin û çûne mala xwe. Ji ser hinek xaniyan nalîna zarokên tagirtî û kuxekuxa kalên qelûnkêş dihat.

Dema ku şervan serpehatiyê xwe ji hev re dibêjin her gav ew şev tê bira Mehsum û dibêje:

-Wê axaftina bi Azad re û weşanên ku ji min re-anîn dafek li min da, ez ketim nava refên şoreşê.

HESEN ZINAR

Gelo wê Chaplin jî bi kurdî bipeyive?

Di 20.7.95'an de Navenda Çanda Mezopotamya-NÇM (MKM), dest bi semînerên sînemayê kir. Semîner, ji bo 3 mehan e û roja çarşem û şemiyên çêdibin. Her dersek, 2 saet didome û 20 kes dikevin dersan. Mamosteyên ku wê dersan bidin jî ev in: Ahmet Soner û Hüseyin Kuzu. Ev xebat, ji aliyê Beşa Hunerên Dîtbarî ya NÇM'ê ve tê organîzekirin.

Li ser semînerên ku NÇM çêdike, me bi berpirsa saziyê heta rejîsor û kursiyerê ku beşdarî vê semînerê dibin, hin pirs kirin.

Berpirsa NÇM'ê Nuray Şen, der barê armanca semînerê de fikrên xwe wiha anîn zimên:

"Hunerên dîtbarî (görsel), ji bo berîguherîna mirovan pir tê bikaranîn. Ev yek ji aliyê dewletê ve pir hat kirin û hîn jî ji bo şerê psîkolojîk û niyetên xwe yê xerab bi kar tîne. Gelê kurd hatiya merheleyekê ku êdî saziyê xwe ji bo haziriya dewletbûnê çêdike. Ji ber vê yekê NÇM, dixwaze van saziyên çandî damezirîne. Heta vê gavê çima sînemaya kurd nehat afirandin? Li gorî baweriya me, îro tam zemanê wê ye."

Nuray Şen, li ser tesîra hunera dîtbar hin mînak dan, wekî MED TV'yê. Li gorî wê, ev sazi û pratîka wê, heycanê dide mirov. Nuray Şen, li ser ihtiyaca semînerê ev got: "Tam di vê



Ahmet Soner



Nuray Şen



Cemal Pîranij

nuqteyê de ihtiyac bi semîneran çêbû. Meraqa ciwanên kurd li hemberî van semîneran heye, ji bo vê yekê me dest pê kir."

Berpirsa NÇM'ê, li ser mamosteyên (rejîsor-nivîskarên sînemayê) jî qala eynî meraqan kir. Li gorî wê, rejîsor Ahmet Soner jî ku wê di semîneran de dersan bide, xwedî heyecanekê ye û dixwaze ciwanan ji aliyê teknîk û listikvaniyê ve bigihîne. Nuray Şen, der heqê perwerdeyî û dersdanê de jî ev got: "Kursiyerên me, agahiyên teknîkî di nava xebata pratîk de hîn dibin. Hedefa me ya pêş ew e ku em bi van xebatan karibin asoya kursiyeran ji aliyê afirandinê ve jî fireh bikin." Nuray Şen, bi munasebeta vê guftugoyê bangî ew kesên ku dikarin alîkariyê bikin jî kir û wiha got: "Em bangî herkesê ku dixwazin sînemaya kurd bi pêş bikeve, dikin û dibêjin bila werin beşdarî van semîneran bibin. Helbet ji derveyî me jî ev faalîyet dikarin bêne çêkirin. Hegeger ku xizmeta van faalîyetan bigihîje gelê me, emê hurmetê nişanî wan bidin, alîkarî û destekê bidin wan."

Wekî me li jor jî got, ji bo semîneran gelek sînemevan û derhênerê navdar, wekî mamosteyan beşdarî van semîneran dibin. Der heqê vê xebatê de me fikrên Ahmet Soner (sînemavan) û beşdarekî semîneran jî stand.

Birêz Ahmet Soner, projeyê wisa çawa hate bîra we, çima û ji bo çi?

- Bi rastî çiroka vê niyaza me bêhtir ji salekê ye. Egerê derengmayîna (vemana) vê niyaza me,

ku bi serokê NÇM'ê yê berê bi İbrahim Gürbüz re me li hev kiribû, di encama hindê egerên ku ji derveyî şiyana me rûdan, heta bi roja me vekêşaye. Lê armanca me ya di vê daxwazê de; ji bo ku em karibin bi riya xwe de herin, vekirina riyeke alternatîf e ji bo sînemaya tirkî ku ji me jî we were, hatiye xetîmandin û ji bo nehêlana helwesta serdestî û bîndestîya bêkêr û kore ya di navbera hoste û şagirtî de. Ji ber ku em jî di bin nîrê vê gerdişê de derbas bûne, tengaviya serkeftina vê xebatê em baş dizanin û êdî em di wê baweriyê de ne ku, ev rewşa han bêguhertin. Di dema me de her tişt ji nûhatîyan tê veşartin û di encama vê kirina naxoş de, rê li geşedana huner û pîşeyê têtê girtin.

Ji bo nimûne, gava ku kameramanan karê guherîna filman dikirin, ji bo ku kes hîn nebe, bi serê xwe diketin odeyekê û vî karê xwe dikirin. Niha ji bo ku pêşî li vê yekê bêgirtin, tenha bi daxuyakirina vê kirina ne li rê, ez ranawestim; nivîsîna senaryoyan û amadekirina filman jî ne hinde zor e ez dibêjim. Bi kurtayî, ez dixwazim ku ezmoniyên (tecrûbeyên) di vî warî de bêne bikaranîn. Di vî warî de çîrokeke herî balkêş jî li Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê, ji layê rêxistinê ve, bûyera belavkirina 1000 kamerayan li ser zarokên reşikan. Gotineke pêşiyên japonîyan vê kirinê wisa şirove dike:

"Li şûna bergeşeke (sofre) dewlemend a ji masiyan, fêrkirina çêjandina (tamkirin) masî bi keskî, bêhtir bi sûde ye."

Bi giranî tu dê kîjan beş sînemayî bi kar bînî?

- Berî her tiştî me jûya sînemaya tirkî û ya cihanê, bikaranîna senaryo-kamerayê, bi dût re jî ronahî, dublaj (zarvekirin) û montaj e. Ji bo vê yekê car caran bi geriyana pisporxanan (laboratuar) û cihên ku di qonaxên ji hev cuda de, hinek berhemên sînemayî lê hatine çêkirin, emê bixebitin ku di pratîkê de em pê kar bikin.

Yên ku semîneran didin kî ne?

- Yê ku semîneran didin, bi durustî ji van navan pêk tên. Lê, hate gotin ku wê ber firehtir bibe. Ji ber ku di rûniştinên dahatû de alîkariya hindê

sînemevanên jêhatî jî wê bibe. Navên ku tên zanîn jî ev in: Senarîst û Kargêrê Weşana Giştî yê Kovara Sînemayî Antrakt, Hüseyin Kuzu yê ku li Sovyeta berê li ser sînemayê hatiye perwerdekirin û nivîskarê pirtûka "Kurgu" ku berî bi çendekê derketibû, Selîm Aslanyürek, Engin Ayça, Menderes Samancılar, Füsün Demirel û Talat Bulut in. Ji niha ve navên ku tên zanîn ev in. Digel van ez jî heme. Di dersên paşerojê de, bi hendê kesên din re jî wê peywendî bêne danandin. Hevalên pişikdar bêyî hîç berjewendiyekê, hemû bi dil û can bizavê dikin.

(Yek ji beşdarên semî-

nerê Cemal Pîranij)

Te çima ihtiyaca semînerê wiha dît?

- Di vê hîlbijartina min de em dikarin li ser du egeran rawestin. Ya yekemîn, wekî temaşevanekî berdewam di warê sînemayî de, êdî ji bo min ne hinde balkêş e. Ya duyemîn û ya herî girîng jî hebûna danheveke zor hindik ya sînemayî di nav kurdan de ku mirov dikare bibêje hema tune ye. Di vî warî de valahiyeke zor mezin heye û divê ev valahî bêdagirtin. Gava ku daxwaz û pêdivî bûne yek, tenê riya pêkanîne li ber mirov dimîne û ji bilî vê jî tu riyên dîtir namînin.

Hêviya we ji vê çi ye?

- Hêviya me ya bîngehîn ji van xebatan jî ew e ku, em di vî warî de bikaribin xwe bi pêş bixin û di geşedana sînemaya kurdî de hindêk pêk tên. Lê, hate gotin ku wê ber firehtir bibe. Ji ber ku di rûniştinên dahatû de alîkariya hindê

Hîn bêhtir we giraniya xwe daye ser kîjan mijaran?

- Bi giranî, digel me jûya hunerî ya cihanê, piştî beşên teorîk ku hindêk demên din jî di nav de ne, dema sînemaya bêdeng, digel senaryo (derhênan) û teknîka kamerayê wê dersên rêveberiyê jî bêne bikaranîn.

Di vê mijarê de nixandînan we yê heta niha çi ne?

- Digel ku hîn em di destpêkê de ne jî, lê ez ji paşeroja vê xebatê gelekî bi hêvî me. Ji ber ku xebatkarên me ji niha ve dest bi dabêşkirina kar kirine. Jixwe mirov nikare bibêje ku xebatkarên me biyaniyên kar û barê sînemayê ne.

EZNAS MAYA
SUUT KILIÇ



Hostayê sînemaya bêdeng Charli Chaplin

Roviyê fenek û şêrê delodîn



Piştî geriyana rojekê ji rojên biharê, serdarê daristanan, şêrê bi xwe bawer, neçîra xwe dike û bi rojava re dizivire mala xwe. Piştî bêhnvedanê radibe şîva xwe çêdike û li ber xwe datîne, dikeve ser şîvê û têr dixwe. Xwarina ku ji ber dimîne, datîne rexeke û ciareyekê ji xwe re dipêçe û vedigere ser cihê xwe û ji xwe re pal dide. Hîna cigara wî nivco nebûye, ji ber derî pêjnek tê. Guhê xwe baş pêl dike, bawerîya xwe tîne ku li ber derî pêjnek heye, lê dernaxe ku ev pêjin a çî ye. Şêr hêdî hêdî diçe li paş derî radiweste. Niyaza şêr ew e ku ji nişkave derî veke da bizanibe ka xwedanê vê pêjnê kî ye. Gava ku şêr wisa ji bo derketina derve xwe amade dike, dibîne ku dergêhê wî taq taq hate lêdan.

Şêr li cihê xwe radiweste û bi dengê nermik dipirse: "Ev kî ye?"

Yê li ber derî bi dengê qeşmerî, hinekî bi ken, hinekî bi tirs wisa bersivê dide: "Ez im mamê şêr, ez im."

Şêr: "Tu kî yî?"

Yê li derve: "Mêhvan im, mêhvan... mêhvanê Xwedê!.. Li ser vê bersiva xwedê! şêrê delodîn derî vedike û dibîne ku mêhvanê wî rovî ye.

Rovî çawa derbasî hindur dibe, dîsa bi wî dengê xwe yê bihêvî û berger wisa dibêje:

– Hey gidî mamê şêr, min got êvara te bixêr. Hey gidî serdarê hemû daristanan. Ey seydayê deşt û zozanan, îşev ez şevder mame. Birçî û bêav mame.

Şêrê delodîn naçar dibe û ji rovî re dibê-

je:

– Fermo, derbas be. Her wisa rovî dîvê xwe li ba dike û kela dilê xwe li ber mamê şêr dadike:

– Mamê şêr ji serê sibê de xwarin bi devê min nebûye. Ez gelekî bêçare bûme.

Şêrê delodîn radibe ji rovî re xwarinê germ dike û tîne li ber wî datîne. Rovî bêserî êrîştî ser xwarinê dike. Piştî ku zikê xwe têr dike û cixareyekê jî, ji kîskê mamê şêr dipêçe û pal dide. Divê navberê de mamê şêr jê dipirse:

– Erê pismam, navê te bixêr?

– Navê min...Navê min virî ye!..

– Dê bila mamê virî. De ka em ji xwe re rakevin.

Her wisa piştî westana rojekê ji rojên biharê, li ser zikê têr, her yek li quncikekî tarî, xwe dirêj dikin.

Bi rojhilat re şêr ji

xewa giran şiyar dibe. Xwe dilebitinê nalebitîne, dike nake dest û piyên wî nalebitin. Carekê li xwe dinêre ku çî bibîne, dest û piyên wî hişk bi weris ve hatine girêdan dizivire ser virî wî li wir nabîne. Carekê serê xwe radike, li jora xwe dinêre dibîne ku mehvanê wî virî li ser latika dide lotika. Rêvî çend lotikan dide xwe û carekê sernişiv dibe û ber bi şêr ve tê.

Gava ku digihîje cem şêr, hêdî hêdî werisê ku şêr pêhatîye girêdan vedike û wisa dibêje:

–Rovî. Hey gidî mamê şêr, ev kîjan xwedan nexêrî ev sosret aniye serê te? Ma tu yê van hawa bûyî?..

Digel vekirina weris, rovî kuriya xwe dibe û tîne, Şêr jî diibin çavan re lê dinêre û serê xwe di-

hejîne. Piştî vekirina weris bi dawî hat, Şêr giran giran rabû ser xwe û ji rovî pirsî:

–Navê te bixêr?

–Navê min tirî...

Digel vê bersiva rovî, şêr giran giran ji çiyê ber bi deştê ve rewan dibe û di ber xwe re dibêje:

Bi girêdan destê 'virrî'
Bi berdona destê 'tirrî'

Vê minetê li xwe nagirim

Bila ez ji xwe re bimirim

Heta hebe pêjna roviyan

Ez hew vegerim van çiyên...

Zarokên xoştivî; ji wê rojê û vir de, dibêjin ku;

Ji derdê fenê roviyan Şêr derketin ji çiyên...

Lê îro, her yek ji we şêrekî delodîn e, divêtê dî li çiyayê we rovî nemîne.

Gelî zarokan, ji bîr nekin ku em bendewarê çîrok û nameyên we ne. Ji me re nameyên xwe bişînin, da em jî karibin rûpelê we bi gotinên we bixemilînin.

GELÊRÎ

N A M E Y Ê N X W E N D E V A N A N

Hêstirên dilşadiyê

serhildan bû....

Ev hêstir, ne yên girî bûn..., ev hêstir, ne ji bo jiyana mirî bûn. Ev rondik, ji tiştêkî re diyarî û xelat bûn.... ev rondik, pêkêşî evîna welat bûn. Rondikên serxwebûn û azadiyê bûn. Rondikên rijandina kela hezarsalan ên kurmanciyê bûn, ên banga sedhezaran bûn ku digotin: "Va ne, em kurd jî hene. Em bi serok in em bi hêz in. Em bi rêzan in, em bi rêber in. Êdî bila cîhan tev bizanibe ku em kurd rabûne ser piyan û heta bi qonaxa serfiraziyê, wê berdewam be ev rêpîvan!"

Bajarê Bonnê bûbû bajarê kurdan, wêneyê Serok û wêneyên pakrewanan, li ser milên hemû canan pêl didan. Xwepêşandanvanan, mîna pêlên di deryayan de, ber bi Meydana Hofgartenê diherikîn. Di nava bêhnê de ew meydana, mîna bûka kurdî dihat alandin. Bi alên rengarêng hatibû xemilandin, gotin û peyvên gotinbêjan, temaşevan hîn bêhtir germ dikirin û bi hêrs dixistin. Te digot qey Kurdistan azad bûye. Bi rastî ez jî ketibûm wê baweriyê. Kêlî-

kekê jî be, min xwe di Kurdistanê azad de didît. Piştî ku nûçeyên rêpîvanê bi dawî dihatin, temaşevanên televîzyona MED'ê hêstirên çavên xwe dimaştin, lê rûyê hemûyan geş bû û devê wan bi ken bû. Min wê hingê zanî ku ev hêstir ên dilşadiyê bûn, lê dilşadiya mezin hîna li pêş e û gelekî nêzik e jî!..

Remezanê Hûrî

Daxwaziyek ji Welatê Me

Birêz xebatkarên rojnâmeya Welatê Me!

Berî her tiştî ji bo xebata we ya pîroz, ez silavên germ û şoreşgerî pêşkêşî we hemûyan dikim. Bi rastî jî, di vê pêvajoyê de Welatê Me roleke girîng hildaye ser milên xwe. Ji ber ku rojnâmeya heftiyê ye, pêwîst e ku hûn zêde li ser

çanda Kurdistanê rawestin.

Wekî tê zanîn, li welatê me şêrê neteweyî pir xurt bûye. Di vir de çanda şêr jî ji bo gelê me girîng e. Daxwaza me ji we, hûn giraniyê bidin ser çanda şêr. Wekî li ser berxwedana şêhidan, biranînên gerîlayan û yên mayî.

Pêşniyara me ev e ku hûn ji nivîsên Serokê neteweyî yên li ser çand û hunerê jî biweşînin.

Di hemû kar û xebatên we de serkeftinê dixwazim.

Behçet Deniz
Girtîgeha Sağmalçılar

Li ser ziman çend gotin

Birêz zimanzanên kurdên hêja! Ez dixwazim çend hevokan li ser zimanê kurdî pêşyazî we bikim, bi taybetî jî li ser tîpên cotdeng. Gelo ev çî

hikmet e min fêhm nekîr, hûn ewqas gengeşiyar li ser dengên cot dikin.

Hinek rewşenbîrên me dibêjin "Tîpên nû divê", hinek dibêjin "Tîpên nû ne pêwîst in." Ma hûn nizanin ev taybetiyeke zimanê kurdî ye ku hinek tîp bi du awayî tîpên xwendin, ji bo wan jî tîpên nû ne pêwîst e, ên ku bi kurdî dizanin, ew dizanin ku ev taybetiyeke vî zimanî ye. Ew dikarin bilêvkirina bi tirkî bifikirin, lê ji bîr dikin ku di tirkî de çend deng hene, lê tîpên wan tune ne. Mînak gava "vermek" tê nivîsandin wekî "vêrmek" tê bilêvkirin. Di tirkî de ne "v" heye û ne jî "ê" heye. Mînak pir in, lê ez dixwazim li ser zimanê kurdî mînanan bidim.

Ji bo ku min got ên ku bi kurdî dizanin, çawa difikirin. Mesela min tu caran nedîtiye ku yekî kurd ev tîpên "k, p, ç, t" çewt xwendine. Ma di çem û çareyê de "ç", di tenî û tenê de "t" çewt tê xwendin. Ez dixwazim li vir li ser îngilîzî jî mînanan bidim; mesela hemû îngilîz

dizanin "short" kurt e (kîn) "şort" tê xwendin, min nedîtiye ku yekî îngilîz gotiye "sihort" û gava çavê wan li nivîsa "one" dikeve, dibêjin "wan." Qet nayê bîra we ka ji bo çî nabêjin "one", lê dibêjin "wan".

Vêca gava em ji bo wan tîpan tîpên nû bixwazin, wê mirovên biyan qerfên (tinaz) xwe bi me nekin? Emê çawa tîpên nû çêkin ku di latîni de çiqas tîp hene me hemû girtine, dîsa jî tîra me nake. Ger em kum û kolozan deynin ser wan wekî "çem" binivîsin Xwedê dizane hûn ji bo wan çî dibêjin. Ji bo ku di klavyeya ewrûpiyan de ew tune ye, emê yên din çawa binivîsin. Ji ber ku armanca me hêskirina ziman e, divê em tîpan kêmbikin, zêde nekin. Îcar ew dewlemendiyeke zimanê kurdî ye, ma hûn dixwazin me ji vê dewlemendiye mehrûm bihêlin? Hin taybetiyên zimanên din jî hene, lê ew ji bo wan serêşî, gengeşiyê çênakin, em çîma wan ji xwe re wekî serêşiyekê dibînin.

Remzî Qolxanli/Ruha

Silav li we gelî xwendevanên Swelatê Me. Ji niha û pê ve ez dê wekî Serokê Lijneya Weşanê di vî quncikî de binivîsim. Ji we ve jî baş diyar û xuya ye ku, em di demeke pir livdar de dijîn. Ji ber van guherîn û tevgeran, di rojnameya me de, bêyî hemdê me be jî, tiştên nû pêk tên. Ev guherîn û guhertin tev ji ber pêdiviyên in. Em bi vî çavî li van qewmîn û rûdanan dini-hêrin.

Gelî xwendevanên me yên hêja, em we bi tenê naxwazin wekî xwendevan bibînin û em nabînin jî. Mebesta me ew e ku em bi hev re vê saziya xwe ya weşanê ya neteweyî bi pêş ve bibin. Wê xurt bikin, mezin bikin. Ji lew re me divê ku hûn rexne, pêşniyaz, nixandî û nivîsên xwe yên celeb bi celeb



Em dixwazin cih bidin nivîsên bi hemû zaravayan

Ji Welatê Me re bişînin. Bi wan, vî rojnameyê bixemilînin. Em di wê baweriyê de ne ku, em bêyî hev nabin. Her pêdiviya me bi hev re heye. Bi gotineke pêşyan, em goşt û hestiyên hev in.

Kêferat û hewlên me yên ji bo zengînkirina rojnameyê didomin. Em lê dixebitin ku kesên di warên xwe de pispor

in, bi nivîsên xwe rengêk bidine rûpelên me. Ji niha bi şûn de, dê nivîskarê navdar Şahîne B. Sorekî jî, ji me re binivîse. Em vê heftiyê nivîseke wî ya balkêş diweşînin. Di rojên pêş de hûn dê rastî navînen din jî bînin ku ew jî di warên xwe de xwedîgotin in.

Em xwe wek rojnameyê neteweyî dibînin her wiha em

xwe wisa bi nav jî dikin û me divê ku bi hemû zaravayên kurdî nivîs di vê weşanê de cih bistînin. Me divê ku em tiştêk daxuyînin; rûpelên rojnameya me ji hemû zaravayên kurdî re tim vekirî bûne û tu car jî nehatine girtin. Em gazî li kesên ku bi kirdkî (dimilkî), soranî û loranî dikin; binivîsîn û ji me re bişînin. Divê em li hêviya hev nemînin. Karê xwe ji hev re nehêlin.

Heta niha rojname bi giranî, bi zaravayê kurmançî derket. Me navê ku ev rewş berdewam be. Em gotinên xwe dicarînin, nivîsîn ji we, weşandin ji me. Hewce ye ku em vê rewşê eşkere bikin, ka çima nivîsên ji bilî kurmançî di nava rûpelên me de kêmbûn. Ji ber nebûna nivîs û nivîskarên van zaravayên kurdî bûn.

Mirov dema bixwaze nifirê li gelekî bike, ya herî baş ew e ku mirov bibêje: "Hûn bîwelat bimînin." Dema ku nifir cihê xwe bigire, malik li wî gelî xerab dibe, ji ber ku ji bîwelatîyê xerabtir tu tişt nîn e. Mirovên ku endamê wî gelî ne jî, li ku devera gerdûnê dibin bila bibin û rewşa wan a aborî çiqasî baş dibe bila bibe, ne mûmkûn e ku mîna mirovekî xwedîwelat bi hêsanî, jiyaneke bîmane bikaribe bidomîne. Serpêlî û bêrûmetî tim para wî ye.

Ez bibawer im, ji me kurdan bêhtir tu kesî derdê jiyana bêmane û bêrûmet nekîşandîye (xemnaxurên bêmeji, dibe ku wê ji xwe re nekin derd. Lê jixwe em jî behsa wan nakin). Dema rewş ev be û mirov welat mîna gewde bifikire; dema laşê mirovan nexweş û bêhal be, gewdeyê mirov ji hemû bakteriyên (mîkro-

ban) re vekirî û mirovan dirizîne, heta mirinê mirov, ji jiyana xwe tu başiyê nabîne.

Mirov hertim bi ax û elem e. Lê dema laşê mirov xurt be, saxlem be, bakterî bikevinê jî, wicûd an wê di nava xwe de dimehîne, an jî diavêje derve. Jiyaneke baş jî didomîne.

Dijminên gelê kurd ew çend pê leyîstine ku, civakê kurd ji hemû nexweşînan re vekirî ye. Armanca me ne ew e ku, em li vir nexweşînan ku di nava civakê kurd de hatine afirandî, bînin ziman. Jê re lêkolîneke mezin û pisporî pêwîst e. Û jixwe ew lêkolîn 20 sal berê hatiye kirin, çareya wê jî hatiye dîtin, şerê wê jî ev 20 sal in tê kirin û ev çareserkirin roj bi roj, ber bi serkeftinê ve diçe. Lê emê ji wan nexweşînan yekê bînin ziman, ku ew nexweşînan ya herî

mezin û bijan e: Rîşami-roxwîr, şerê xwebixwe-tiyê, derd û elema birakujiyê. Çima, ji bo çî, ji bo kê? Belê, em qala kula giran başûrê Kurdistanê dikin; dema hate gotin ku ew kul ji nû ve derbûye û xwîn jê diherike, janê da kezaba me. Lê em pir ecêb jî neman. Ji ber ku, dema ku kul neyê dermankirin, an jî ne ya dermankirinê be, neyê jêkirin, wê hertim ew kul derbibe û wê her tim jî jan bide kezaba me.

Hezar heyf û mixabin ku bi dehan sal in li Başûr, ji ber polîtîkayên gêm, ji ber berjewendiyên çend kesan, kurd xwîna birayên xwe dirijînin û her çiqasî ne bi madiyê û ne jî bi tiştê din neyê pîvandîne jî.

Berî çend rojan di TV-MED'ê de, di bîrnameya "Kursiya Gel" de, ku li ser şerê birakujî gotûbêj dihat kirin, endamê Ko-

mîteya Navendî ya PDK'ê Kemal Kerkûkî û Endamê Komîteya Navendî ya YNK'ê Wezîrê Çandiniyê (Zireetê) Sadî Muhamed Pîre jî mîhvanên "Kursiya Gel" bûn û tevî wê gotûbêjê bûbûn. Li hemberî xweyên gel, li ber xwe nedan û mecbûr man û gotin ku: "Emê hilbijartîneke demokratîk çêkin, dema gel me nexwaze, emê hurmetê ji dîtina gel re bikin û emê xwe bi paş ve bidin" Xweş xeber e, lê mixabin min ne bawer e. Ji ber, nabe ku mirovên axa, beg karên demokratîk bikin. Kiribûna wê çil sal berê bikirana. Ew û demokrasî di beroşekê de nakelin.

Tê gotin ku dermanê her derdî heye. Serokatî, îdeolojî, polîtîka û bipêşveçûyîna tekoşîna rizgariya Kurdistanê ku bi taybetî li Bakur geş dibe, di hemû

gerdûnê de îspat kirine ku ji vî derdê bêderman re jî dermanek heye. Her çendî jî bîwelatî her tişt dihatê serê gelê kurd û gelek bakterî jî di navê de peyde dibûn jî, îro ev dermanê derdê her çar parçeyên Kurdistanê jî derman dîke. Gelê Kurd polîtîze dibe, ev îdeolojî (derman) dibe ronahiya jiyane. Gelê kurd bi giyan dîke û êdî kurd dikarin li ser lingên xwe bimeşin. Dema ev wiha dibe, wicûd xurt dibe, saxlem dibe. Di wicûda saxlem de, debara mîkroban nîn e. An direvin an jî dimihin. Bi vê pêşkeftinê, ev mehandin xwe li başûrê Kurdistanê jî dide xuyakirin. Pir nêzik e ku dawî li van mîkroban bê, ji ber ku ji vejîne, em êdî gav bi gav ber bi rizgarbûyîne ve dimeşin. Rizgarî ronahî ye, paqijî ye. Mîkrop, di deverên ronahî û paqij de, nikarin bijîn.

SALAR AMEDÎ

Kula giran başûrê Kurdistanê

FERHENGOK

Alandin: Lefandin. Zîne, destên girêdayî ye.

xwe li stûyê Momo aland

Aşîna: Nas, naskirî

Balinde: Teyr

Berhingari: Pêşlêgirtina bizavekê yan jî rûdanekê (Şervanên azadiyê berhingarî êrîşa dijmin bûn)

Binbirkirin: Îmhakirin

Çavkanî: Serekanî, jêderk.

Çavdêr: Muraqib, yê ku li ser karekî bi taybetî radiweste

Çavdêrî: (Gözetim)

Dembuhêrk: Sohbet, derbaskirina demê bi axaftinê

Destnîşan: Tesbît, daxuyakirin

Elend: Şefeq, piştî berbangê, zelalbûna asoyê ji rexê rojhilat ve; elind jî tê bilêvkirin

Eles: Tam, çêj (tad)

Gelêrî: Her tiştêkî ku bi gel ve

Gorepan: Meydan, arena

Helkeftin: Lêrasthatin, tesadufkirin,

Helwest: Destnîşankirina cih û nêrîna xwe li hemberî her rûdanekê (Mewqif). Helwest jî tê bilêvkirin.

Hinartin: Şandin.

Kelepor: Berhemên gelêrî yên kevnare

Koledar: Kesên xwedan kole

Patexwer: Kesê ku bi dijminê gelê xwe re kar dîke

Ragihandin: Ji hemû navgînan mîna tv, radyo û hwd. re tê gotin.

Sava: Ji 6 mehî heta bi 3-4 salî ye

Şemze: Karik û berxika li ber şîr.

Şûnwar: Binexih, devera mirov bi xwe lê dijî

Zevî: Erd, erdê çandinê

Zordar: Kesê ku tade dîke

AGAHIYÊN ABONETIYÊ

Min Welatê Me Divê

| | Li Hundir | Li Derve |
|---------------------------------|---------------------------------------|---------------------------------|
| <input type="checkbox"/> 3 Meh | <input type="checkbox"/> 550.000 TL | <input type="checkbox"/> 45 DM |
| <input type="checkbox"/> 6 Meh | <input type="checkbox"/> 1.000.000 TL | <input type="checkbox"/> 80 DM |
| <input type="checkbox"/> 12 Meh | <input type="checkbox"/> 1.800.000 TL | <input type="checkbox"/> 150 DM |

Bedelê Abonetiyê ez radizînim

Li Tirkiyê – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti. Yapı-Kredi Parmakkapı Şubesi Hesap No: 1100264-1

Li Derve – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti. Yapı-Kredi Parmakkapı Şubesi Döviz Tevdiat Hesap No: 3001507-3

NAV Û PAŞNAV :
NAVNIŞAN :

Navnişana Welatê Me

Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu/ İST.
Tel-Fax: 293 53 19 – 293 53 20

WELATÊ ME

Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
ROZA Basın ve Yayıncılık
San. Tic. Ltd. Şti. adına
Xwedî (Sahibi)

Aynur BOZKURT

Heyeta Weşanê
(Yayın Kurulu)

Zana FARQÎNÎ
Aynur BOZKURT
Sami TAN
Suut KILIÇ

Berpirsiyarê Karê Nivîsaran
(Yazışlıeri Müdürü)

Metin AKSOY

NAVNIŞAN (Adres)
Ayhan Işık Sok. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL

TEL-FAX
293 53 19 – 293 53 20

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

NÜNERİ
(Temsilcilikler)

Suriye– Jan Dost
Fener Rojbiyanî
Berlin– Silêman Sido
Sirwan Reşîd
49-30-69 00 26 95
Hannover– Selim Biçûk
49-5721-813 60
Hamburg– A.Hekim Gülsûn
49-40-40 33 88
Munchen– Mahmut Gergerli
49-871-670 884
Badenwürttemberg–
A. Rahim Ayaz
49-75453258
Amsterdam– Cotyar Zaxoy
31-20-613 07 66
Paris– M.S. Ayçiçek
33-1-48000401
Atina– Ferhan Zêbarî
30-13634905
Bruksel– Medenî Ferho
32-16-49 07 67

HELBEST

AHMED ARIF

Têbiniyên ji Bedena Diyarbekir û Lorîka Adîloş



WERGÊR

DILDAR ŞEKO

Lênagere destên min
Bo bîhok û hinarên wê
Ku can xwe, ranedigirt.
Dişkînim stûyê xwe û diçim.
Ne ew delîveye
Ku gur û balinde bizanibin
Tew nepirsin.
Laaaaall
De bila fermana reş derkeve
Li serê rîyan raweste.
Tar û mar e gulistana yarê
Perçem li hemberî xwînê ye.
Her û were qevdek can e
Ku min pêşkêşkirî
Di ber qeda û bela wê de
De bila ez bimrim looo...
Destên min vala
Lingên min buse ye
Ew jî,
Tenê ezê zanibim ku
Çawa bi harî min jê hez kir.

Ya din jî,
Dev heye ziman tune ye
Bedena Diyarbekir.

Dertên,
Sor wek xwînê gulên heftcare
Û ji layekî ve berf dibare
Berba dibe Qerejdax
Berba dibe zozan.
Binêr,
Simbêlê min qeşa girt min sar e jî
Barove jî her dihere dirêj kir.
Her wekû buharî tu
Ez te tînim bîra xwe
Mîna Dîyarbekir te...
Ji çî û çî xurttir nayê ma
Elesa bîranîna te.

Ava Hemrewat qerimî
Li ser Dicle çar tilî qeşa
Ji çalê bikar tînin em ava xwe

Bo tasik û beroşa
Ji lîlavê em çêdikin çaya xwe.
Mîna razekê vedişêre
Dayika min jana xwe.
"Baye, buharî dê çit" dibêje.
Xuşka min ducaniye giran e
Tu wê dinasî
Keçeke ciwan e
Cara yekê ye
Ji layekî ve şerm dike vedişêre
Û ji layekî ve jî ditirse
"Dê mirim" dibêje.
Vê zivistanê
Wê canekî din li me zêde bibe...
Minalim,
Li kîjan devera xwe te veşêrim?
Bixêr bêyî
Bixweşî bêyî
Xwarzîkê Ahmed Arif.

Tu çêbûyî.

Sê rojan me tu birçî hêlayî
Sê rojan me pêşîr neda te
Adîloşê min.
Da tu nexweş nekevî
Ji ber ku gerdişa me wisa ye
Hêriş bide pêşîrê niha
Hêriş bike û mezin bibe.

Evana
Tîremar û ziha ne
Evana
Yên ku çav berdane nan û danê me
Nas bike vana
Nas bike û mezin bibe.

Eve namûs e
Li nasnama me hatiye kolandin
Eve jî aram e
Ji jehran hatiye parzinandin
Rapêçe vana
Rapêçe û mezin bibe.

elinewêrek

BINÊRIN DARWÎN ÇI DIBÊJE: "DEMA
BAGEREK RADIBE, TÊ DE MÊSÊN KU
PER Û BASKÊN WAN XURT IN JÎ DIMI-
RIN, LÊ YÊN KU PER Û BASKÊN WAN
ŞKANDÎ NE, JI BER KU NIKARIN BIFIRIN,
NAKEVIN BER BAGERE Û SAX DIMÎNIN
Û ZIRATA XWE DEWAM DIKIN."

...YANÊ HÛN JI MIN RE
TIRSONEK DIBÊJIN.
LÊ SEDEMÊN ŞÊL Û
TEVGERÊN MIN
HENE !..

WEKÎ KU EM PÊ
DERDIXIN, TE TIRS JI XWÊ
RE KIRIYE WEKÎ DÎN Û
TU BÛYÎ PÊXEMBERÊ
JÎ DÎN Î...

